

## Kamîya Bawerîyêka qedîme: Êzidîtîye (1)

**MILETÊ** kurdî ke miletanê eslîyan yê rojhelatê mîyanên ra yew o, bi zaftewirîya cografya, folklor, lehçe, dîn û bawerîyanê xo bale anceno. Na zaftewirîya kurdan ra yew nimûne zî êzidîtîye ya.

RÛPEL 11



## Gencîneyên Kurdî: Nivîs

**HEMÛ** gencîneyên Kurdî hêj derneketine ser rûyê jiyana nivîskî. Bi hezaran berhemên Kurdî yên şexsî û saziyan him di serdema me de û him jî yên serdemên berê ku hêj nehatine çapkirin hene.

RÛPEL 12



## Kî dibêje Dêrikî nikarin bifirin?

**HIN** mirov bi stranan, hin bi dansê hin jî dema difirin xwe azad his dikin. Ez ê ji we re çîroka yekî Dêrikî ku gava difire xwe azad his dike vebêjim.

RÛPEL 14


# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ
Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 18
08 - 14 GULAN 2017
www.basnews.com




SERXWEBÛNA KURDISTANÊ: S2

# REFERANDUM DI DAWIYA 2017'an DE YE

**> PROSEYA SERXWEBÛNA KURDISTANÊ BERDEWAM E**

Hikûmeta Kurdistanê ragihand ku referandum wê di 2017'an de bê kirin. Beriya niha ji bo pêkanîna referandumê dîrokeke destnîşankirî tunebû lêbelê bi daxuyaniyên li pey hev, hat aşkerakirin wê referanduma serxwebûnê îsal pêk were.

**> MESRÛR BARZANÎ: REFERANDUM DÊ ÎSAL PÊK WERE**

Mesrûr Barzanî, ragihand ku referandum ji bo ragihandina biryara miletê Kurd bo serxwebûnê riya herî meşrû ye û got: "Referandûm dê îsal pêk were. Encama referandumê dê nîşan bide ku serxwebûn biryara miletê Kurdistanê ye.



EKREM ÖNEN >02

Hevdîtina Putîn û Erdoğan Rûsya û Tirkiye



MURAD CÎWAN >04

Şûr zû hatin Kêşan



HOŞENG OSÊ >05

PKK û Öcalan û Azadiya Jinê


S3 HOŞYAR SIWEYLÎ



## Serxwebûn mijara navxweyî ya Kurdistanê ye!

Ji bo proseya aştiyê, rola Serok Barzanî û Herêma Kurdistanê di asta navbeynkariyê de ye. Her wiha rola Birêz Ocalan jî gelek xurt bû. Serok Barzanî dixwaze her du aliyan nêzî hev bike ji bo çareseriyeke mayînde.

S4 BERDANA PARLAMENTERÊN HDPê



## Proseyeke nû di rojevê de ye?

Li Tirkiyê hê jî rola Kurdan a di pesendkirina sîstema nû de, cihê xwe yê di rojevê de diparêze û piştî referandûmê berdana siyasetmedarên Kurd jî bi xwe niqaşên 'proseyeke nû destpê dike' anî.

S5 SABAHATTIN KORKMAZ



## Li Başûr prosesa serxwebûnê rîsk û derfet

Serok Barzanî di her serdan û civînên xwe de serxwebûna Kurdistanê anî rojevê. Di rêya serxwebûnê de luksa tu kesî û tu aliyî ku meseleyên îdeolojîk, grûpî, dînî û mezhebî derxin pêş tune.



EKREM ÖNEN

## Hevdîtina Putîn û Erdoğan Rûsya û Tirkiye

Di hefta borî de serokkomarê Tirkîyê Erdoğan serdana Rûsya kir û li bajarê behra reş Soçî bi serokkomar Putîn re hevdîtin pêk anî.

Dema mirov li medya Tirkîyê û a Rûsya dinêre her yek ji wan bi awayekî encamê hevdîtina ji raya xwe ya giştî re didin diyar kirin. Medya Tirkî weke ku Rûsya wê ambargoya ser wan rake û di pirsa Sûriyê de, fuzeyên S400 û pirsa vîzeyê li hevkiribin nîşandan. Medya Rûsan jî weke Putîn tiştên xwest bi Tirka dan qebûl kirin. Pirsa vîzeyê, vîze ne bes ji xelkê re her weha  ji bo serokên şîrketên mezin jî ranekirin, pirsa S400 tu tiştekî konkret bi dest Tirkan de bernadane, pirsa ambargoyê bi temamî ranekirin, ji bo hinek şênayiya rakirin lê tişta Tirka dixwest ji ser firîngiya rakin Rûsya ew ranekir, gumruka Tirka danîbûn ser genim û rûnê ji Rûsya dikirin rakirin, di pirsa Sûriyê de tişta Putîn û Trump beriya rojekê ku Erdoğan here Rûsya li hevkiribûn bi Tirka dan qebûlkirin. Her weha di pirsa Kurdan de ku ji bo Tirkan pirsa esasiye, Rûsya di vê pirsê de jî tu tişt bi dest Tirkan de bernedaye. Jixwe di pirsa Kurdan de ji beyana Erdoğan jî diyare ku tu tiştekî konkret bi dest wan de bernedane. Ji ber Erdoğan di vegera xwe de di balefirê de ji rojnamevana re got; “Putîn li avakirina dewleteke Kurd li Bakurê Sûriyê germ nanêre” jixwe heta niha weke fermî tu serokdewleta negotiye ez piştgiriya dewleta Kurd dikim. Di dîplomasiyê de kesek a xweyî talî pêşî nabêje. Heger Putîn jê re rastî weha gotiba Erdoğanê bi gota ne ku germ lê nanêrin wê bi gota ew li dijî dewletek Kurdin, lê diyare ji bo ku Putîn tiştekî konkret jê re ne gotiye, Erdoğan him ji bo raya giştî a Tirkiyê her weha ji bo hevdîtina xwe ya 16ê gulanê a bi Trump re beyanek xwedêgiravî “Putîn germ li dewletek Kurd li Bakurê Sûriyê nanêre” daye. Beriya demekê dîsa Erdoğan got ku Putîn ji min re gotiye; “Min fam bike, ez ne abûqatê Esad im.” Rûsya ev beyana Erdoğan tekzîb kir. Ev tişt tev yên medya herdû welatan bûn ku min behs kir ji bo ku Kurd bi nûçeyên medya neyên xapandin û siyasetê li ser esasê nûçeyên medya nemeşînin. Wek geopolîtîk û stratejîk dervî konjukturel, Tirkîye û Rûsya du welatên ku di 100 salên dawî de dijberî hevin (li Balqan, Kafkas, Asya Navîn, Behra reş û li Rojhilata nêzîk û navîn) her çiqas car caran konjukturel li hev dikin jî lê di stratejiyê de ne li hevin. Weke mînak ji tebaxa 2016an heta niha ev cara 5a ye ku Putîn û Erdoğan hev dibînin, biqasî min ev 5 civînên dawî şopandin, her car Tirkiye bi gelek hêvî û beyanên mezin dawiya civînê tîne. Lê Rûsya pir bi hizir li tevaya van civînan nêriye. Tirkî herdem beriya û piştî civînan gelek beyanên bi deng didin paşê jî wek xwe dikin. Ji ber wê jî niha di medya Rûsya de gelek dibên; “Tirkiye bawerî pê nayê û peymanê îmze dike lê naîne cih” biya min ev hevdîtin jî wek yên berê wê tu encam jê dernekeve. Di têkiliyên Tirkiyê bi Rûsya û DYA re du pirsên esasî ku Tirk bersîvek zelal ji Rûsya û DYA dixwazin hene, Rûsya û DYA jî tu bersîvek konkret, zelal wek ew dixwazin nadin wan. Ji van pirsa yek jê dîzayna nû a herêma rojhilata nêzîk û navîn de cihê Tirkîyê li ku ye? Pirsa dudan û ji bo Tirkan pirsa herî girîng rewşa Kurdan wê çawa be? Ev herdû pirs rê li ber Tirka şaş dikin. Pirsa din a ku Tirkî baş tê nagîhêje ev e, hîn jî li ser hesabên wek serdema şerê sar dixwaze li ser nakokiyên DYA û Rûsya bilîze. Tirkî nikare fam bike ku nakokiyên DYA û Rûsya niha ne fikrî antagonîst wek yê serdema şerê sar e. Ji ber wê jî hemû lîstikên wan bê encamin. Niha jî di vê hevdîtina bi Putîn re peymana herî girîngî hatî îmzekirin peymana li Sûriyê 5 herêmên ewlekariyê avabikin. Ji rewşa Tirkiyê tê fam kirin ku ewê vê peymanê jî pêkneyenin. Ji ber ev peyman ne li gor siyaseta ew niha dimeşînine. Ji vê peymanê tişta Rûsya û DYA fam dikin û Tirkiyê fam dike cudaye. Her çiqas gelek ekspertên siyasî dihesibînin ku DYA û Rûsya li ser herêmê li hevkirine lê mirov tiştekî weha konkret nikare bêje tevî işaretên li hevkirine gelek in. Lê tişta eşkere ku Tirkî nikare qebûl bike ew e ku di siyaseta DYA û Rûsya de li ser herêmê, Kurd di hesab de ne ev nayê wê wateyê ku DYA an Rûsya ewqas aşiqê Kurda ne, îro berjewendiyên wan û Kurda nêzî hevin. DYA û Rûsya ji bo bighên armancên xwe Kurdan wek faktorekî  nêzî xwe dibînin. Tirk ji DYA û Rûsya dixwazin û dibên; “Emê li Kurda xin hûn jî deng nekin.” Bêguman DYA û Rûsya biya Tirkan nakin  Ev me li Minbîcê her weha di êrîşên dawî ên li ser Şengal û Qereçox dît. DYA û Rûsya ji Kurdan hez dikin an na, tişta Tirk dixwazin dijî stratejiya van herdû welatane. Ji vê hevdîtina Putîn û Erdoğan işaretên ku DYA û Rûsya di pirsa Sûriyê de kar li hev par kirine, wek min li jor jî got peymana 5 herêmên ewlekariyê peymaneke ku DYA û Rûsya li ser li hevkirine diyare her yek ji alî xwe de aktorên herêmî wek Tirkî, Îran Siûdî, Qatar û hwd. îqna dikin. Tevgera Tirkî li herêmê û cîhanê bi teybet bi Rûsya û DYA re tev ewe ku bazarê li ser Kurdan dike, amadeye ji her kesî re her tiştî bike tenê nehêle Kurd li herêmê xwedî desthilat bin. Heta Tirk ji vê kompleksê rizgar nebin wê her di vî halî debin. Tişta Kurd bikin siyaseteke rasyonel bimeşînin û baş fam bikin ne DYA û ne jî Rûsya û ne tu kes li vê cîhanê ji bo Kurdan tenê, li herêma Tirka, Ereba, Farisa û hwd. nadin alîkî. Lê divê Kurd bi siyaseteke pragmatik netewî bi DYA, Rûsya û Awrûpa re têkiliyên xwe wek berê berdewam bikin û xurttir bikin. 16ê gulanê Erdoğan û Trump dicivin em binêrin çi ji vê civînê derdikeve?

Serxwebûna Kurdistanê

# Referandûm di dawiya 2017’an de ye





RABİA ÇETİN

Hikûmeta Herêma Kurdistanê ragihand ku referanduma serxwebûnê wê di 2017’an de bê encamdan. Beriya niha ji bo pêkanîna referandumê dîrokeke destnîşankirî tunebû lêbelê bi daxuyaniyên li pey hev, hat aşkerakirin wê referanduma serxwebûnê di dawiya îsal de pêk were. Herwiha tê ragihandin ku Kerkûk jî bêyî pêkanîna benda 140’î a destûra Îraqê ku li ser herêmên bi nakok e, wê beşdarî referandum serxwebûnê bibe.

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî hefteya borî aşkere kiribû ku: “Dema ragihandina serxwebûnê hatiye. Lêbelê em dixwazin bi rêyên diyalog û aştiyane ji Îraqê veqetin. Di vê mijarê de miletê Kurd dê biryarê bide. Eger em li benda diyariyeke civaka navdewletî bin, dewleta Kurdî wê qet nebe. Ev nîv sedsal e em ji bo parastina yekgirtina Îraqê kar dikin. Li hemberî vê çi gêhişt destê me? 4 hezar û 500 gund hatin wêrankirin, em rastî êrişên kimyewî hatin. Tenê ji malbata min 10 hezar kes hatin qetilkirin.”

Rawêjkarê Encûmena Asayîşa Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî, bersiva rexneyên li dijî biryara pêkanîna referanduma serxwebûnê da. Mesrûr Barzanî diyar kir ku divê ew di mijara referanduma serxwebûnê de ne li benda dîrektîfên tu aliyan bin û axaftina xwe wiha dewam kir: “Divê em êdî dawiyê li jiyana di bin hikûmraniya hinekan de bînin. Divê beriya her tiştî baweriya me bi serxwebûnê hebe. Ji bo ku referandûm pêk neyê sedemên cuda davêjin holê. Em guh nadin van sedem û kesan û em ji biryara serxwebûnê poşman nebin. Çi biqewime jî referandum dê di dîroka hatiye destnîşankirî de bê kirin. Referandum ji bo ragihandina deng, biryara miletê Kurd bo serxwebûnê riya herî meşrû ye. Encama referandumê dê nîşan bide ku serxwebûn, ne biryara kesekî an jî partiyekê, biryara hemû miletê Kurdistanê ye. Li Kurdistanê gelek netew, ol û bawerî hene û Kurdistan ne tenê ya Kurdan ya hemû Kurdistaniyan e.

Mesrûr Barzanî axaftina xwe wiha domand: “Encama referandumê dê biryara xelkê Kurdistanê ji hemû cîhanê re ragihîne. Referandum û serxwebûn di hemû qanûnan de mafê miletan e. Her miletek xwedî mafê diyarkirina çarenivîsa xwe ye û em jî dê vê mafê xwe heta dawiyê bikar bînin. Em jî dê serbixwe bin û destûrê ji tu kesî nexwazin. Tu kes nikare birayara miletê Kurdistanê bigûherîne. Di dilê hemû Kurdan de serxwebûn heye. Tevî hemû astengî û dijwariyan jî em ê referanduma serxwebûnê pêk bînin û di riya serxwebûnê de astengiyeke din jî ji holê rakin. Di demeke ku her miletek çarenivîsa xwe diyar dike de, em qedera xwe di destê Îraqê de nahêlin. Tevî komkujiyên Helebçe, Enfal û yên din jî ji me re gotin ji Îraqê veneqetin. Hê jî hin alî hene ku dibêjin hûn çarenivîsa xwe bi xwe diyar nekin. Lêbelê em ê di çarçoveya qanûnên navdewletî de Kurdistana serbixwe ragihînin. Meseleya serxwebûnê ne gef e li dijî miletên din. Serxwebûn mafê miletê Kurd e. Her demekê hêzên hevpeyman û DYA wê alîkar nebin. Ji bo diyarkirina sînoran û parastina miletê Kurdistanê em piştgiriyeke xurt bidin Pêşmerge ku bergiryê li ber dewleta xwe bike, bo me bes e.”

**Biryara referandûmê ji DYA re hat ragihandin**

Nûnera Herêma Kurdistanê yê DYA Beyan Samî Abdulrahman, diyar kir ku biryara pêkanîna referandumê ji DYA re hatiye ragihandin û wiha got: “Me ji DYA re ragihand ku ji pêkanîna referandumê armanc, diyarkirina biryara miletê Kurd ya di derbarê pêşeroja siyasî û îdarî ya Kurdistanê ye.”

Nûnera Kurdistanê yê DYA herwiha destnîşan kir ku Kurdistanê bi rêveberiya nû ya DYA re di asteke bilind de pêwendiyên dîplomatîk ava kirine û wiha pê de çû: “Di nava rêveberiya nû ya DYA û kongreyê de gelek dostên ku piştevanên herêma Kurdistanê û miletê Kurd in hene. Em bi dostên xwe yên di nav rêveberiyê de di nava pêwendî û hewldanan de ne, bi taybet jî di mijara serxwebûnê de, fişarê li ser rêveberiya DYA bikin ku piştgiriyê bide serxwebûnê ku mafê me yê xwezayî ye. Lêbelê DYA hê jî piştgiriya Îraqeke yekgirtî dike. Lê ev ne siyaseteke mayîn de ye û wê biguhere. Me nîşanî herkesî da ku em di aramî û îstîkrara herêmê de aktorekî sereke ne. Em êdî nikarin baca şaşiyên Îraqê bidin. Rêveberiya nû ya DYA rewşa Îraqê, rola Herêma Kurdistanê ya di têkşikandina DAIŞê û di parastina penaberan de herwiha geşedanên li  herêmê dibîne.”

**“Kurdistan serî li rêbazên şer nade”**

Nemaze jî ji aliyê Îran, Sûriye û Tirkiyeyê ve li ser mijara referanduma serxwebûna Kurdistanê, daxûyaniyeke zelal nehatiye dayîn. Hikûmeta Kurdistanê jî ji bo ragihandin û gotûbêjkirina biryara referanduma serxwebûnê di serî de Îran bi welatên cîran re, komîteyeke serxwebûnê ava kiribû. Li gor agahiyên ku di kulîsên Hikûmeta Herêma Kurdistanê de tê axaftin, di proseya referandum û serxwebûnê de li gor gotinên Mesûd Barzanî wê bi Îraqê re pêwendiyên aştiyane û diyalogê bên avakirin. Eger Îraq di mijara serxwebûnê de li pêşberî îradeya Kurdistanê ranewaste, Kurdistan bi ti awayî serî li rêbazên leşkerî û tundiyê nade. Îraq, êrişî Kurdistanê neke, şer li gel Îraqê nayê kirin. Di vê mijarê de jî berpirsên Hikûmeta Herêma Kurdistanê daxwaza alîkariyê ji civaka navdewletî bo Kurdistan û Îraqê dikin. Ji bo tayînkirina çarenivîsên xwe tê xwastin ku bi her du aliyan re jî hevdîtin bên kirin.

Berpirsên Hikûmeta Kurdistanê van daxwazên xwe wiha tînin ziman: “Li gor dengên ku ji welatên Ewropî derdikevin, li bandor û encamdana referandumê ya li ser berjewendiyên xwe dinêrin û di vî warî de guhertineke erênî heye. Bi taybet jî ji aliyê Serokê Kurdistanê ve tê daxwazkirin ku beşdarî proseya serxwebûnê bibin û piştgiriyê bidin. Jixwe Kurdistan li benda ti welatên Ewropî û yên din nîne ku yekser piştgiriyê bidin, an jî li ser vê meselê biaxivin. Ya ku Kurdistan ji Ewropayê û ji cîhanê dixwaze dema ku hatin Kurdistan û Îraqê bila qala parastina yekgirtina Îraqê nekin. Ji ber ku Îraq ji xwe weke yek parçe nemaye. Niha bi awayekî fîîlî 2 hikûmet û 2 dewlet in. Yek Îraq û yek jî Kurdistan e. Gotinên li ser yekgirtina Îraqê weke çekekê ye li dijî îradeya miletê Kurd. Hevgirtina Kurdistan û miletê Kurd ya bi Îraqê re êdî tu bingeha xwe nemaye. Tu derfetên mayîna ligel Îraqê nemaye. Divê  her hevdîtin di çarçoveya rêzgirtina îradeya miletê Kurd de were kirin. Yên ku mayîna ligel Îraqê dixwazin li dijî îradeya miletê Kurd in. Dibin sedema Îraqeke di nav şerê mezhebî û etnîkî de. Eger li dijî îradeya miletê Kurd nesekinin, dikarin bingehekê ji bo çareserkirina kêşeyan di navbera Îraq û Kurdistanê de ava bikin. Herwiha wê li Rojhilata Navîn bibin alîkarê pêkvejiyana miletan û aramî û aşitiya herêmê.



## Berpirsyarê Karûbarên Derve yê PDKê Hoşyar Sîweylî:

# Serxwebûn mijara navxweyî ye

**HOŞYAR SÎWEYLÎ**

Hikûmeta Herêma Kurdistanê ragihand ku referanduma serxwebûnê dê îsal pêk bê. Her wiha referanduma Kerkûkê û heremên di bin nîqaşê de ne jî dê di sala 2017'an de were kirin. Helwesta Îranê û Tirkiyeyê, piştî biryara referanduma serxwebûnê ciyê mereqê ye. Ji bo agahdarkirina dewletên cîran komîsyonek hatiye avakirin û ev komîsyon xebatên xwe didomîne. Em bi berpirsyarê karûbarên derve yê PDK Hoşyar Sîweylî re li ser mijarên Serxwebûna Kurdistanê, têkiliyên Tirkiyeyê û Herêma Kurdistanê, rewşa Şingalê axivîn. Berpirsyarê Karûbarên Derve yê PDK Hoşyar Sîweylî diyar kir: "Serxwebûn, mijara nevxweyî ya Kurdistanê ye. Ji bo me ya girîng biryara gelê me ye. Nirxandina dewletên din piştî vê astê ji bo me girîng in."



BARHAM MUSTAFA



PDK beriya çend mehan di nav xwe de guhertina çend mevkiyan kir, yek ji van guhertinan jî berpirsyariya karûbarên derve ye ku cenabê we bûye berpirsyar. Ev guhertinên stratejîk in, an siyaseta navxweyî ya partiyê ye? Di vê astê de hûn dikarin çi bikin, stratejiya we di derheqê karûbarên derve de dê çawa be?

Bêguman di her partiyê de guherîn proseyeke xwezayî ye, PDK jî xwedî dîrekek dirêj a siyasî ye, van guhertinên wisa her tim di PDK de çê bûne. Bi giştî jî sedema van guhertinan ji bo ku bername û karên partiyê bileztir bên kirin. Bêşik ev guhertinên wisa di kongreyan de tên kirin. Mixabin di navbera kongreya me 13. û 14. de demeke dirêj heye. Me kongreya xwe di wextê wê de pêk neanî. Ji ber vê yekê jî Serokatiya Partî û Serok Mesûd Barzanî ev guhertin pêwîst dîtin. Çend sedemên pêknehatina kongreya me hene. Ev sedem: "Şerê li hember DAÎŞa terorîst, krîza darayî, mijarên navxwe yên Kurdistanê ne." Li ser van guhertinan di hemû organên partiyê de nîqaş hatin kirin û piştî lêkolînên nêzîkî salekê biryar hat dayîn. Ji bo aktîfkirina şaxên partiyê ev guhertin hatin kirin. Guhertina maqaman pergal û stratejiya partiyê naguherîne. Wateya guhertinan ew e ku siyaseta heyî bi awayekî aktîftir bê meşandin. Armanca guhertinan bidestxistina rihekî zindî ye. Siyaseta partiyê ji aliyê Serok û Cîgirê polîtburoya partiyê ve tê amade kirin. Siyaseta partiyê tenê di kongreyê de tê guhertin. Karê me jî rêvebirina vê siyasetê ye.

**PDK bi giştî tê rexnekirin ji ber têkiliyên xwe yên bi Tirkiyeyê re, tenê têkiliyên PDK û AK Partiyê baş in an jî ev têkilî di asta herî bilind de di navbera Hikûmeta Tirkiyeyê û Herêma Kurdistanê de ne?**

Têkiliyên me bi hemû dewletan re, bi hemû hikûmetan û bi hemû partiyan re li ser berjewendiyên me ne. Ne tenê bi dewletên cîran re, bi dewletên herêmê re jî bi yên cîhanê re jî em têkiliyên xwe li ser berjewendiyên Kurd û Kurdistanê datînin.

> "Têkiliya me ya bi Tirkiyeyê re li ser berjewendiyên me hatiye avakirin.
> Ji bo nefta Herêma Kurdistanê bigihêje bazara xwe, Tirkiye tekane rê ye."

Têkiliyên bi Tirkiyeyê re jî li ser vê bingehê ne. Têkiliyên me bi Tirkiyeyê re ji bo berjewendiyên Kurdistanê ne. Mînak, ji bo nefta Herêma Kurdistanê bigihîje bazara xwe, Tirkiye tekane rê ye. Têkiliyên me yên aborî jî xurt in. Her wiha Kurdistan jî ji bo Tirkiyeyê bazareke baş e. PDK tu carî naxwaze bi dewletên cîran re têkiliyên xwe xera bike. Ev yek jî bo berjewendiyên gelê Kurdistanê pêwîst e. Bêguman têkiliyên PDK û AK Partiyê jî baş in. Ji ber ku him îktîdar e him jî bi Hikûmeta Herêma Kurdistanê re miameleya Hikûmetê birêve dibe. Dema Serok Mesûd Barzanî diçe Tirkiyeyê li balafirxaneyê Ala Kurdistanê hildidin. Serokkomar û Serokwezîr pêşwazî li Serok Barzanî dikin. Têkilî, mîna têkiliyên du dewletan e. Ev jî dide nîşandan ku têkilî li ser esasên wekheviyê pêk tên.

**Li gor we ev têkilî dê ji bo serxwebûnê jî bidomin, hûn ji bo serxwebûnê diçin referandumê, dê Tirkiye piştgiriya vê proseyê bike?**

Referandum û serxwebûn karê navxweyî yên Kurdistanê ye. Ji ber vê yekê herî dawî em li fikra dewletên din dinêrin. Em li biryara îradeya gelê xwe dinêrin. Gelê me bingeha biryara îradeya xwe ye. Berî niha jî min bilêv kiribû, têkiliyên me li ser berjewendiyên me hatine danîn. Ji bilî berjewendiyên siyasî û aborî em û Tirkiyeyê cîranên hev in. Hidûdekî mezin di navbera me de heye. Berjewendiyên me yên ewlehî jî girêdayî hev in. Pêşiya referandumê axaftina di vê mijarê de bê wate ye, bi taybetî jî nirxandina nêrîna Tirkiyeyê. Lê bi giştî dewletên cîhanî û yên cîran ne li hember referandum û serxwebûnê ne. Heta niha tu dewletê ne gotiye "Kurdistana serbixwe pirsgirêk e û divê negihêje vê astê" bi rêya referandumê em ê biryar û îradeya gelê xwe bigihênin wan dewletan jî.

Hûn têkiliyên xwe bi taybetî li gel AK Partiyê datînin, çima li gel CHP, MHP û HDP danaynin, têkiliyên we li gel HDPê çawa ne?

Têkiliyên me li gel AK Partiyê baş in. Lê ji ber Hikûmeta Tirkiyeyê ji wê partiyê pêk tê. Li gor fikra min, AK Partî demek dirêj dê li Tirkiyeyê desthilat be. Piştî AK Partiyê dê kîjan partî bibe desthilat nizanim. Lê kîjan bibe îktîdar jî em li nêrîna wan ya di derheqê Kurdistanê dinêrin. Bi MHP re têkiliyên me tune ne. Ji ber ku partiya nijadperest a Tirk e. Hîç mimkun nîne ku mafê gelê Kurd bixwaze û biparêze. Ji bo berjewendiyên Kurdistanê heta astekê mirov dikare li gel CHP bixebite. Têkiliyên me li gel HDP baş in. Wek partiya Kurdan di parlementoya Tirkiyeyê de dixebite. Lê tu carî me li gel MHP danûstandin nekiriye.

**Gelo proseyeke nû di rojeva Tirkiyeyê de ye, rola Herêma Kurdistanê di vê pêvajoyê de dê çi be?**

Ji bo proseya aştiyê, rola Serok Barzanî û Herêma Kurdistanê di asta navbeynkariyê de ye. Her wiha rola Birêz Ocalan jî gelek xurt bû. Serok Barzanî dixwaze her du aliyan nêzî hev bike ji bo çareseriyeke mayînde. Her du alî jî dizanin ku Serok Barzanî dixwaze roleke erênî bileyîze. Serok Barzanî gelek caran ragihandiye ku amade ye ji bo çareseriyê rola xwe bileyîze. Serok Barzanî û Herêma Kurdistanê ji bo proseyeke nû navendên girîng in. Daxwaza Herêma Kurdistanê û Serok Barzanî ne tenê destpêkirina proseyeke nû ye her wiha çareseriyeke mayînde jî ji bo vê pirsgirêkê dixwazin. Di proseyên berê de mekanîzmayên destnîşankirî birêve neçûn. PKK rola xwe bi cih neanî û bû sedem ku ji berê jî xirabtir bibe. Ez serkeftina proseyeke bêyî PKK dûr nabînim. Ji proseya berê divê sûd bê girtin. Divê ev prose bigihêje armanca xwe, nebe sedema wêrankirina mal û warên Kurdan.

**Hûn wek Partiya Demokrat a Kurdistanê ji ber toleransa xwe ya li hember Tirkiyeyê tên rexnekirin...**

Wek berê jî min anî zimên, li dijî berjewendiyên gelê me û hikûmeta me em têkilî danaynin. Yên PDK sûcdar dikin bila "Sê mînakên" di derbarê toleranskirinaTirkiyeyê de bibêjin. Ev tenê sûcdarkirin e. Me tu carî tenezul nekiriye. Em Tirkiyeyê wek şirîkê xwe dibînin her wiha Tirkiye jî Herêma Kurdistanê şirîk dibîne. Di navbera me de dîplomasiyeke xurt heye.

**Dibêjin têkiliyên we li gel PKK nemane, bi rastî jî têkiliyên we qut bûne, ev yek ji ber ku PKK di lîsteya terorê de ye an têkiliyên we veşartî hene û hûn ji ber Tirkiyeyê rasterast têkilî danaynin?**

Nexêr, ne yek ji van jî. PKK, li DYA û Ewropa di lîsteya terorê de ye. Lê heta niha "PKK li Herêma Kurdistanê ne di lîsteya terorê de ye" Hikûmet û Serokatiya PDK jî di heman nêrînê de ne. Têkiliyên me li gel PKK baş in, lê dibe ku pirsgirêkên PKK li gel me hebin. Tirkiye di derbarê PKK de tu carî fişare li me nekiriye. Mijara PKK ev e: Pirsgirêka ji Herêma Kurdistanê re derdixe. PKK dibe sedema bê îstîkrariyê, bi taybetî jî li Şingalê. PKK dibe asteng ku Şingalî vegerin ser mal û milkên xwe. PKK, ji avakirina Şingalê re astengiya derdixe. PKK, dibe asteng ku Herêma Kurdistanê û saziyên navnetewî alîkariya Şingaliyan bikin. Ji ber ku saziyên navnetewî û dewlet nabin alîkar, herêmên di bin krîza siyasî, emnî û leşkerî de ne. Mixabin, Şingal hê jî di vê rewşê de ye. Hê jî alîkariyên divê bihatana kirin nehatine kirin. Sedema vê yekê jî hebûna "Şervanên PKK" li wê deverê ye. Hebûna PKK li Şingalê deryasayî ye, divê vegerin navçeyên ku jê hatine. Ew kesên dibêjin lê; "PKK di parastina Şingalê de roleka girîng leyîstiye, Pêşmerge jî di parastina Kobanî de roleke girîng leyîst û piştî rizgarkirina Kobanî vegeriya deverên xwe." Daxwaza me ji PKK ev e. Heger pêdivî bi alîkariya Kurdistanê dîtibin û hatibin, niha jî pêdiviya Kurdistanê di şerê Daîşê de bi alîkariya PKK tune ye. Ji ber ku him li Kurdistanê him jî li heremên derveyî 140'î de DAÎŞ nemaye. PKK jî ber ku li Şingalê bû Tirkiye êrîş bir ser Şingalê û 6 Pêşmergeyên me Şehît bûn. Heger PKK ne li Şingalê bûya dê ji Tirkiyeyê re jî manî tune bûya.

**Gelo rewşa Şingalê dê çawa çareser bibe, PKK dê li deverê bimîne an rêyeke din heye? Hûn dixwazin ku PKK ji Şingalê derkeve, eger dernekeve?**

Şingal, bi taybetî jî Mûsil piştî şerê DAÎŞê dê bibe mijareke tevlîhev. Piştî jinavbirina Daîş'ê li Mûsilê, dê planên aktorên sereke yên cîhanê û dewletên herêmê derkevin holê. Ajandeya Îranê di vê mijarê de taybet e. Îran, dixwaze korîdorekê di navbera Suriyeyê û Îranê de veke. Îran dixwaze bigihêje Şingalê û ji wir jî xwe bigihîne Suriyeyê. Di dîrokê de çiyayê Şingalê ji bo êrîşbirina li ser dewletên herêmê hatiye bikaranîn. Îhtimal heye ku Şingal ji bo derxistina alozî li Rojhilatanavîn bê bikaranîn. Her wiha planên Îraqê jî hene. Berjewendiyên Tirkiyeyê jî hene li herêmê. Tirkiye naxwaze Qandîleke nû derkeve holê. Ji ber van sedeman jî mijara Mûsil û Şingal pir tevlîhev e. Divê hemû aliyên Kurdistanê baldar bin û divê hemû alî ji PKK daxwaz bikin da ku ji Şingalê derkeve. Heger bi vî halî çareser nebe îhtîmal heye ku rewş xirabtir bibe. Dixwazim vê yekê jî destnîşan bikim ku; "Tu partî naxwaze PKK li Şingalê bimîne. Hemû aliyên siyasî bi awayekî fermî ji PKK xwestin ku ji Şingalê derkeve" Divê PKK jî ji Hikûmet û Partiyên Kurdistanê re bi rêz be û daxwaza wan bi cîh bîne.



### Helwesta Tirkiyeyê ya li hember bilindkirina Ala Kurdistanê li Kerkûkê tund bû, ev bertekên tund tenê ji bo propagandaya referanduma Destûrê bûn?

Ji 2013'an ve li Kerkûk û deverên derveyî Herêma Kurdistanê Ala Kurdistanê jixwe bilindkirî ye. Ji bo vê yekê çend pirsên pêwîst divê bên pirsîn. Ji ber çi heta niha kesî bertek nîşan neda? Mexmûr, Giwêr, Dûz, Xaneqîn û gelek deverên din jî Ala Kurdistanê hebû û bilindkirî bû. Wê demê sedemên baştir û mercên çêtir ji bo berteknîşandina Tirkiyeyê hebûn, ji ber çi nîşan neda û çima di dema referanduma Tirkiyeyê de ev bertek nîşan dan? Çima berteka wan wisa tund bû? Bilindkirina alê, mafê gelê herêmê yê xwezayî ye. Em ne li benda razîbûna partiyan in ku em dizanin dê bi her awayî bertek nîşan bidana. Erdoğan ji bo razîkirina hevkarê xwe MHP û alîgirên xwe ew daxuyanî dan.





MURAD CÎWAN

## Şûr zû hatin Kêşan

Referandûma li ser guhertinên destûra Tirkiyeyê li gor daxwaza serokayetîxwazan encam da; 'erê' %51.4, 'na' %48.6. Lê bi marjînaleke gelek piçûk, ferqa navbera wan bû %1,4.

Cara pêşîn e, ne demokrasiya pirpêkhateyî be, heta serweriya takedestî be jî, bi destûrî , bi dengdanên hilbijêran, hilbijartî kî be ê bibe fermanrewa. Di tarîxa tirkan de guhertineka nipînuh... Helbet ji bo sîstema nuh, lazim e guhertinên yasayî yên li gor destûra nuh, bi taybetî ya partiyan û ya hilbijartinan bên deranîn, wêne wê gavê ê zelaltir bibe.

Di nîvzelaliya îro da ya xwiya, hilbijartina serokatiyê eger zûtir nebe jî ê di 2019ê de bibe fînala qonaxeka şerekî siyasî yê gelek dijwar.

Guhertina destûrê, ji daxwaza anîna sîstema serokatiyê bêtir ya misogerkirina serokatiya Erdoğan ji bo bi kêmasî yek-du dewreyên din bû.

Encamên referandûmê ev hêvî neda Erdoğanî. Ferqa navbera rêjeya 'na' û 'erê' wek Pira Siratê ye (%1,4). Ne ji şertên zor ên rewşa neasayî, derfetên dewletê û yên medyayê ên li gel 'erê', koalisyona li gel rêveberiya MHPê, îddîayên ciddî ên li ser rêjeya zerfên nemorkirî buya karibû rewş bi vacayî derketa.

Xetereka mezin a ku vê destûra Erdoğanî ew qas ji bo wê şer kir di 2019ê de yekî din bike serok derket. Rêjeya piraniya 'na' ya bajarên mezin alarmder e.

Qonaxa ku Erdoğan dengên ne tenê dost, piştgir, hevkarên civakî û siyasî, lê yên dîndaran, heta yên nav Ak Partiyê wenda dike destpê kiriye. Rojnamevan, nivîskar û akademisyenên li pişt Ak Partiyê li ser esasê 'yên heta bazaran û yên heta mezaran' dest bi tasfiyeya hevdu kirine. Êdî behsa berbijêriya Abdullah Gül a di hilbijartinên serokatiyê de tê kirin.

Ji bo hilbijartinan wext teng e. Lazim e qanûnên li gor destûra nuh bên derxistin. Divê hesabekî baş bê kirin da yasayên hilbijartin û partiyan bêîstîqrarîyê neynin, serokatiyeka xurt û parlamentoyeka hevseng derkeve. Misogerkirina serokatiya Erdoğanî li pêşiya hemûyan e.

Diyar e, mezintirîn tehdîd ne bi maneya ku ê biserkeve, lê bi ya perçekirina dengan berbijêriya Abdullah Gül tê dîtin. Ne tenê Erdoğan, gelek navendên din, tirsa xwe ya ji berbijêriya serokbûna Gül eşkere kir û ji nuha ve şûrê şerê siyasî ji gelek aliyan ve hat kêşan.

Medya îddîa dike ku Îlker Başbuğê serokê vesayetgêran ji bo di destpêkê de Gül pûç bike mil hildane. Tê xwestin ku Gül wek kesekî bawerpênayiyê ji bal devletê ve bê nasandin. Her sê wêneyên xortaniyê yên Gül, serokerkan Akar û rojnamevan Koru, şîroveyên li ser wan, îşareta vê ne. Başbuğ û taxima xwe mesele bir heta dereceya ku Gül rê li ber revandina sirrên dewletê yên ji 'odeyên kozmîk' vekiriye û ew ketine destên Fethulayiyan û pê re jî yên biyaniyan (DYA). Lê goya Erdoğan buye rêgirê li ber vê sirrdizînê. Nexwe vesayetgêr ji Erdoğan û Gül, hê Erdoğan tercîh dikin.

Şûrkêşekî bêsebir jî Denîz Baykal derket. Hê ji berî referandûmê dest bi planan kir. Ew çû ba Ahmet Türk. Yek ji merivên vesayetgêran ê nav CHPê Tuncay Özkan jî li zindanê seredana Demirtaşî kir. Baykal li gel Kiliçdaroğlu civiya û ultîmatomek dayê: 'Ya xwe berbijêrê serokatiyê îlan bike, serokê partiye bimîne, yan jê vekişe.' Baykal dixwaze bibe serokê CHP'ê û yê Tirkiyeyê jî. Wî Meral Akşener û Ahmet Türk jî wek cîgirên serok dan rex xwe.

Ahmet Türk deng nekir. Heyf, diyar e ev mesele li Qesra Qenco hatiye bestin. Lê Akşenerê, eşkerekirina navê xwe bê hayjêhebûna xwe, bênezaketiyeka mezin a sîyasî nîşan da.

Baykal bi van re, bi balkêşî 'îtîraf' kir ku yê karibe bibe berbijêrê serokayetiyê yê %49'ê, Gül e. Eşkerekirina navê Gül bêyî haya wî, ji xêrxwazîyê bêtir wek planeka pûçkirina wî xuya kir. Kiliçdaroğlu planên Baykal, ne tenê tasfiyekirina Gül ya xwe jî dibîne.

Baykal ne di meydana siyasî ya normal de tevdigere. Plangêrîya wî ji odeyên veşartî yên pişt deriyên daxistî dertê. Lê li gel kê ev 'xwarin' tê pahtin? Hinekan xistiye serî, goya ew bi vê hamleye dikare hem Gül, hem jî Kiliçdaroğlu pûç bike, xwe derxe pêş.

Hin derûdor, Erdoğan li pişt gavên Baykal dibînin. Helbet beralîkirina Gül ê bi dilê Erdoğan be, lê ew zêdetir wek hemahengiyeka li gel îfşakirinên Başbuğ xuya dibe.

Nexwe, hesab ew e ku serokê Tirkiyeyê ê di tûra duyê de bê hilbijartin. Erdoğan di herdu turan de jî heye. Wesayetgêr hêvî dikin di ya duyê de li hember Erdoğan ne Gül û Kiliçdaroğlu, heta ne Baykal, yekî ji wan hebe; belkî Başbuğ bi xwe. Wan hêvî ew e di tûra duyê de bi nefreta ji Erdoğan, hilbijêrên %49ê bidin wî.

Yanî di tûrikê pîjkirên Baykal de esas piştî pûçkirina Gül û Kiliçdaroğlu ya Erdoğan heye. Ger ev nebû, tercîha wan a duyê Erdoğan e.

Berdana parlamenterên HDPê

# Pêvajoyeke nû di rojevê de ye?





CESİM İLHAN

Li Tirkiyê di 16'ê Nîsanê de ji bo guhertina destûr û sîstema Tirkiyê referandûm pêk hat û sîstema nû bi 51'ê dengên 'Erê' hat pesendkirin û herwiha hê jî rola Kurdan a di pesendkirina vê sîstemê de, di cihê xwe yê di rojevê de diparêze. Piştî referandûmê hat gotin ku Kurdan ji bo vegera proseya aşitiyê gotine 'Erê' û berdana siyasetmedarên HDP û DBPê jî di vî warî de bendewariyeke xurt ava kir. Hevserokê HDP Selahattin Demirtaş jî ku ji 4'ê Mijdara 2016'an û vir ve girtî ye, di peyama xwe ya dawîn de diyar kir ku di pêşerojê de wê tifaqên nû pêk werin û vê yekê niqaşên nîşana destpêkirina proseyeke nû bi xwe re anî. Partiyên Kurdî jî derbarê vê meselê de ji Basê re axivîn. Partiyên Kurdî radigihînin ku tu têkiliya berdana parlamenterên HDP bi referndûmê re nîn e û destnîşan dikin ku îhtîmala destpêkirina proseyeke nû niha ne zêde ye.

**"Li asoyê çareserî xuya nake"**

Berdevkê Tevgera Azadî Sedat Doğan diyar dike ku destpêkirina proseyekê û rewşeke aram bo Kurdan li asoyê xuya nake û wiha pê de diçe: "Ev sed sal e, karta Kurd her tim ji bo qeyîmkirina desthilata aliyekê tê bikaranîn. Dewlet û desthilat bo ku gavên xwe baştir bavêjin dibe ku hinekî nerm tevbigerin. Lêbelê herkesek ji aliyê xwe ve vê miletê mazlûm bi kuştin, zor û zilmê terbiye dike ku daxwaza mafên xwe neke. Eger li holê îradeyeke bihêz û meşrû hebûya ev şerê qirêj nedibû. Hindî ku aliyên vî şerî polîtîkayên xwe ji binî ve neguherin û rûbirû nebin, aşitiyeke mayînde ne mimkun e."

**Pevçûnên dijwar, hêviya vala derdixin**

Serokê Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK) Mustafa Özçelik jî dibêje ku hem siyaseta dewletê ya tund a li navxwe û derve û hem jî daxuyaniyên PKK yên dijwartirkirina şer, hêviyên proseyeke nû têk dibin û axaftina xwe wiha berdewam dike: "Me ji destpêka pevçûnan û vir ve bi dehan caran bang li herdu aliyan kir. Em niha jî dibêjin ku divê proseyeke rasteqîn ku hemû partiyên Kurd di nav de cihê xwe digirin û dibin muxatabê dewletê dest pê bike. Me her tim daxwaza çareseriya siyasî kiriye." Özçelik li ser peyama Hevserokê HDP Demirtaş jî wiha diaxive: "Em nizanin ka qesta birêz Demirtaş ji 'îhtîmala tifaqên nû' çiye. Lêbelê divê Kurd nebin amûrên siyaseta AKP, MHP û CHP ku herdem dibêjin 'yek dewlet, yek milet, yek welat, yek al'. Ji bo ya girîng li Kurdistanê bi bernameyeke netewî û demokratîk, tifaqeke berfireh ya aliyên Kurdî ye. Di vê serdema ku li Rojhilata Navîn nexşe ji nû ve tên çêkirin de, divê daxwaza statuyeke siyasî esas bê girtin." Özçelik herwiha destnîşan dike ku divê hemû siyasetmedarên Kurd bên berdan.

**"Em ji bo destpêkirina proseyeke nû ne xweşbîn in"**

Cîgirê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê(PSK) Hasan Dağtekin, dibêje eger proseyeke nû destpê bike divê ev bi berdana parlamenteran neyê sînordarkirin û wiha pê de diçe: "Divê bi partiyên Kurd yên derveyî HDP re jî pêwendî bên avakirin û pêşxistin.Girtina parlamenterên HDP neheqî ye. Em hêvî dikin berdana wan nîşana destpêkirina proseyeke nû be. Divê ji bo çareseriya meseleya Kurdî diyalog destpê bike." Dağtekin li ser gotinên Demirtaş yên bo 'tifaqên nû' jî radigihîne ku ew vê yekê weke nîşandana nîyeteke baş dibînin.

**"Proseyeke nû, girêdayî hevdîtina Erdoğan û Trump e"**

Serokê Giştî yê Partiya Azadî û Sosyalîzmê (OSP) Sînan Çiftyürek, destpêkirina proseyeke nû girêdayî hevdîtina Erdoğan û Trump a di 16-17'ê vê heyvê de ye. Çiftyürek, dibêje divê Kurd bingeha serdana Erdoğan baş binirxînin û wisa dirêjiyê dide gotinên xwe: "Rojeva vê hevdîtinê pêvajoya li Başûrê Kurdistanê û Rojava ye. Hebûna DYA û Rusyayê li hidûdê Tirkiyeyê ji bo çareserkirina pirsgirêkên Bakurê Kurdistanê proseyeke nû şert dike. Hevdîtina Erdoğan li gel Serokê DYA baş bê nirxandin. Kiryarên li Rojava tesîrê li Bakur jî dike."

Di derheqê berdana parlementerên HDPê de jî Çiftyürek, girtina parlementerên HDP weke dîlgirtinê binav dike û dibêje: "çawa berdidin wisa desteser jî dikin"

### "Divê pêşiya siyasetmedaran bê vekirin"

Serokê Partiya Maf û Azadiyan (HAK-PAR) Arif Sevinç jî destnîşan dike ku asayîbûna rewşa Tirkiyê girêdayî çareserkirina meseleya Kurd e û radigihîne: "Divê proseyeke nû destpê bike û divê PKK têkoşîna çekdarî bide sekinandin û herwiha divê pêşiya siyasetmedaran bê vekirin. Lêbelê ez ne di wê baweriyê de me ku PKK û Qendîl di vê mijarê de bikarin bi serê xwe xwedî biryar bin. Li Tirkiyê piştî guherîna sîstemê wê gelek tişt ji nû ve bên dîzaynkirin. Heyama li pêşiya me berovajî gengeşî û aloziyan wê asayîbûn û tifaqên nû bi xwe re bîne. Divê em bibînin ku hê gelek karên AKP mane ku bi netewperesta Tirk MHP re bike. Divê Demirtaş demildest bigihêje azadiya xwe. Divê hem ji girtîgehê derkeve û hem jî ji bin nîr û darê PKK derkeve. Eger ev pêk neyê gotinên wî bicih nayên."

"Di demeke nêz de proseyeke di formata berê de destpê nake"

Sevînç axaftina xwe wiha dewam dike: "Serokkomar Erdoğan di şert û mercên Tirkiyê de rîskeke mezin wergirt û li Îmraliyê bi Öcalan re, li Osloyê bi PKK re hevdîtin hatin kirin û HDP weke muxatabê siyasî hat qebûlkirin. Lêbelê ev prose ji dest çû. HDP û PKK stratejiya xwe li ser dijayetiya Erdoğan ava kirin û bûn aliyê şerê desthilat yê di navbera partiyên Tirk de. Bi stratejiya 'Em te nakin serok' proseyekî girîng ji dest çû û berdela vê giran bû. HDP bandora xwe winda kir û hat dîtin ku tu karîgeriya Öcalan jî tune ye. Ez bawer nakim ku AKP di demeke nêz de proseyeke di heman formatê de bide destpêkirin.

Berdana siyasetmedaran nîşaneyek e

Endamê Rêveberiya PDK-Bakur Bora Balin jî radigihîne ku ew nikare bêje bernameyeke destpêkirina proseyeke nû heye û wiha diaxive: "Lêbelê berdana parlamenterên HDP nîşaneya nermbûnekê ye. Piştî referandûmê sîstema Tirkiyê guherî. Divê Tirkiye çarserkirina meseleya Kurdî bi awayekî sîstematîk deyne pêşiya xwe. Lê di van şertan de em nikarin ji bo destpêkirina proseyeke nû qala projeyeke şênber bikin. Proseya beriya niha ku di asta partiyan de bû bi ser neket û çareseriyeke mayînde neanî, ji ber ku ev meseleya du partiyan, meseleya miletekî ye.



Arif Sevinç



Bora Balin



Hasan Dağtekin



Mustafa Özçelik



Sedat Doğan



Sinan Çiftyürek

# Li Başûr prosesa serxebûnê: Rîsk û derfet



SABAHATTIN KORKMAZ

Ev demeke dirêj e (bi taybetî li ser peyam û gotûbêjên Serok Barzanî) bahsa serxwebûna Başûrê Kurdistanê tête kirin.

Serok Barzanî bi her wesîlê û li her platformê vê behsê tîne ziman. Barzanî, bi munasebeta 100 saliya Peymana Sykes-Picot, ji rojnama Gûardîanê re vekirî got; ew sînorên ku li gor Peymana Says-Picot hatibûn danîn, mîada xwe tije kiriye. Bi taybetî li Iraq û Sûriyê divê sînorên heyî ji nû ve werin rastkirin.

Peyama Barzanî weke starta prosesa serxwebûnê hate pejirandin û deng veda. Piştî hîngê di temamê ziyaret û hevdîtinên xwe de, Barzanî peyama xwe teqez kir. Her weha ji parlamentoyê jî xwest ku pêvajoya referandûmê bidin destpêkirin.

Helwest û biryara serxwebûnê, divê neyê şêlûkirin. Gelo wext e an newext e, wê dewletên cînar çi bêjin, ecêba çend dewletên dinyayê wê me nasbikin; destek û piştgirbin...

Helbette em ê ji dinyayê destekê bixwazin. Bi dewletên cîran re jî hevdîtinan pêkbînin. Di vê rê de heta ku ji dest bê, pêwîst e em dujminê xwe kêm, dostên xwe zêde bikin.

Di rêya serxwebûnê de lûksa tu kesî û tu aliyî ku meseleyên îdeolojîk, grûpî, dînî û mezhebî derxin pêş tune. Di prosesa serxwebûnê de herkes divê bi herkesî re li rêyên hevkariyê bigere.

Lazimî xwe dike ku bizavên hemû parçeyan pozîsyonên xwe li gora rîsk û ewlehiya pêvajoya serxwebûna Başûr bistînin. Ger hewce bike divê xebatên xwe biguhêrin, bidin rawestandin.

Ji serxwebûna Kurdistan a Başûr hêja, grîng û mumkûntir (mesela 'mumkûnatê' faktirekî girîng e. Îro li her çar perçeyan jî ya ku herî mumkûn e, serxwebûna Başûr e. Li Başûr mumkûn e ku serxwebûn îlan bibe, belê li Bakûr nemumkûn e (a-nuha) ku yek xalekî make-qanûna dewleta tirk were guhartin. Heman tişt ji bo parçeyên din jî dikare were gotin).

Serxwebûna Başûr ji bo her parçeyî divê bibe xeta sor! Kî ku destekê bide serxwebûnê (mesela, wexta dewleta Suûdî, dewleta Îsraîl, yan jî Mahmûd Ebas, bêjin "em destekê didim dewletbûna kurdan"), ew dibin dost û mutefîk.

İdeolojî, dîn, partî û rengê serxwebûnê tune! Helbet tu civat homojen nîn e, Kurdistan belkû ji her dera dinyayê bêtir heterojen e. Ji her alî de; ji aliyê etnîkî, olî, mezhebî, kulturî û her weha îdeolojiyan de plural e. Her kesek dikare xwedî fikr, helwest û îdeolojiyeke cuda be. Belê di mesela serxwebûnê de lazim e hemî ferqiyet werin hilanîn.

### Tirs û Têgiha Rîskan ji Rîskan Xetertir e

Carekî li vê dinyayê hele li Rojhilata Naverast tu halekî bêrîsk tune. Jiyan bi xwe rîsk e. Hedef, armanc û destkeftî çiqas mezin bin, rîsk û belayên xwe jî hewqas mezin dibin. Ev anatomiya xwezayê ya "tiştan" e. Marîfet, dûrbînî, biryardariya, mirov/miletan, di rojên teng û li hember barên giran kifşe dibin. Mesela hesap-kîtab-îhtiyatê tiştekî din e, cesaret, biryardarî û dûrbînî tiştekî din e. Herdu helwest hem hevdu temam dikin, hem hevdu red dikin.

Ji 50 salî zêdetir Kurdan li Başûr şer kirin, tu felaket nema ku bi serê wan de nehat, tu garantiya wî şerî hebû? Baş e tu garantî û destkeftiyeke berbiçav ya şerê PKK yê vî 40 salên dawî ku li Bakûr tê meşandin heye?

Di dinya îro de rîskê îlankirina serxwebûnê, ji deha yekê hêrîşa DAİŞê, Halepçe û Enfala nîn e. Kurdan tu xerabî bi sûnî-selefiyan nekiribûn. Ên ku li Iraqê mafê sunîyan parastin, ên ku Haşim Haşimî ji destê Malikî xelaskirin Kurd bûn. Ên ku weke mezhebî nêztirên hev in dîsa Kurd û erebên sune ne. Belê wexta ku firsend dîtin DAİŞê di şevekê de xwest ku kurdan biqedîne.

Ji bîra nekin; qiyama şêx Seîd jî, jenosayda Dêrsimê jî, li Mahabadê bi dardakirina pêşewa jî, Helapçe û Enfal jî, encama bêdewletiyê bûn. Heger dewleta Kurdan hebûya (helbet qesta me dewleteke modern, dewleteke bi dinya medenî re hevalbend, dewleteke ji heqê însanan re rêzdar e) wê ev ecêbên giran bi serê kurdan de nehatina. Ji wê bonê; kî ku naxwaze careke din bi van felaketan re rû bir û bimîne, divê destekê bide serxwebûnê.

### Rîskên Berê Nemane

Em dikarin bahsa du rîskên sereke bikin: Yek jê Îran e. Iraq û Sûrya di derdê serê xwe de ne. Bi navê wan jî Îran li cephê ye. İran helbet dewleteke mezin e, dewleteke plangêr e. Xwedî hesap, stratejî û projeyan e. Belê Kurd muhtacî tu tiştekî Îranê nîn in. A duduyan, neyartiya Îranê di nazara dewletên rojavayî, YE û DYA, Îsraîl, Suûdî Erebîstan, heta Tirkiyê de sempatiya Kurdan zêdetir dike.

Dimîne Tirkiye. Eksê Îranê îhtiyaca Dewleta Başûr bi Tirkiyê heye. Tirkiye deriyê bejayî yê bê alternatîf e. Ji wê bonê helwesta Tirkiyê jî, têkilî û îtîfaqa bi Tirkiyê re jî grîng e.

Tirkiye berî îlankirina serxwebûnê, alaya Kurdistan li koşka serokkomar û balafirxanyên navdewletî hilda. Serokkomar Erdogan berî nuha bi demekê gotibû "heger li dijî me nebe, em têkil nabin".

Bi qenaeta min Tirkiye ji xeynî hin beyanên nerazîbûnê (ku ew jî li pêşberî raya xwe ya hundur), wê proplemekî weke ambargo, derîgirtin, hele mudaxeleyekî eskerî qet neke. Heta Erdogan aktorekî pragmatîst e, wexta ku binêre, dinya qebûl dike, belkî pêşiya herkesî ew nas bike.

Hin teref (bi taybetî Îran û Şîa) bi israr dixwazin têkilî û pirên navbera Başûr û Tirkiyê xera bikin. Ev ne di berjewendiya Kurd-Kurdistan, ne jî di ya Tirkiyê-Tirkan de ye. Di vir de stratejî eşkere ye; Persî/şîatî dixwaze bi kevirekî du çivîkan biqulipîn e. Ku ew jî berhevdana Kurdan û Tirkan e. Sedî sed menfîeta Îranê di nakokî, şer û qeyranên di navbera Tirkiyê û Kurdistanê de heye. Ev hem hesabê do ye, hem yê pêşerojê ye.

Faktirekî din jî ku lazim e em bahsa wê bikin, siyaset û helwesta PKK ye (ku ev jî siyaseta Îranê ye). Maalesef PKK bûye enstrumanekî di destê Îranê de.

Di vê çerçevê de ez dikarim bêjim ku êrîşa DAİŞê jî, şerê PKK yê 'Xendeqan' jî, hebûna PKK li Şengalê jî, girêdayî yek projeyê ye.

Û li pişta van herdû projeyan jî, tilî û planên Îranê hene. Îran, hem li Tirkiyê û hem li Iraqê karta PKK gelekî efektîf bikar tîne. Şerê PKK yê li dijî Tirkiyê



Ji 50 salî zêdetir Kurdan li Başûr şer kirin, tu felaket nema ku bi serê wan de nehat, tu garantiya wî şerî hebû? Baş e tu garantî û destkeftiyeke berbiçav ya şerê PKK yê vî 40 salên dawî ku li Bakûr tê meşandin heye?

(rastiya xwe dijî Erdogan) jî, siyaseta PKK ya li Rojava jî çûna PKK ya Şengalê jî, hemû bi desteka Îranê û li gor berjewendiyên Îranê ne.

Belê wekî ku dibêjin "hesabê Xwedê" jî heye. Îranê di ser hikûmeta Malikî de rê li ber vekir ku DAİŞ têkeve Mûsilê. Plan ew bû ku Kurdan û Erebên sune bi hev bide qirkirin. Ku ji herdu aliyan jî xelas bibe. Belê ji alî Kurdan de ew plan ters zîvirî. Êrîşa DAİŞ û şerê li dijî DAİŞê tecrûbeyekî mezin da Kurdan.

Çi ne ew awantaj: a-) Miletê Kurd bi dinyayê (dost dujmin) da îsbat kirin ku ew ji bo parastina welat, hebûn û şerefa miletê xwe, xwe ji tu belayê re nadin paş. b-) Bi vê ve girêdayî piraniya dewletên dinyayê sempatî, destek û alîkariyeke mezin (DYA, Germanya, Fransa û Birîtanya jî di nav de 85 dewletên cîhanê alîkariya eskerî, lojîstîk û beşerî dan/didin Kurdan. c-) Di tarîxa Kurdan de cara ewil e ku seranserê Kurdistanê dikeve bin destê Kurdan.

### Bê Kerkûk Esla

d-) Bê Kerkûk serxwebûn nabe! Kerkûk û pirsa Kerkûkê (weke ku bi tirkî dibêjin "kırilma noktası") ji bo hemû aliyan noqta şikestinê ye. Êrîşa DAİŞê rê li ber vekir ku ala Kurdistanê li ser banê Kerkûkê hate hildan.. E-) Di encamê de Kurd bi ser ketin û moral-motîvasyonekî bilind da Kurdan, F-) Dinya îro ji do zêdetir qebûl dike ku Dewleta Iraqê perçe bûye û êdî ev perçe nema ku hev bigirin.




Karîkator ----------- Dijwar Ibrahim



HOŞENG OSÊ

## PKK û Öcalan û Azadiya Jinê

Serokê PKKê, birêz Abdullah Öcalan di pirtûk, şirove û analîzên xwe de, ji salên 80î ta 90î, kêm caran li ser rewş û mijara jinê rawestiya ye, lê piştî salên 90î û heta niha, jin û mafên wê, bûne mijareke serek ya Öcalan, heta radeya ku azadiya Kurdistanê bi azadiya jina Kurd ve girêdaye. Di despêka salên 90î de Öcalan pir rexne li dayika xwe û li jina Kurd dikir, lê piştî Öcalan hate girtin, êdî gelek pesnê diya xwe û jinê dide û jin weke ku "netewe" be dinirxîne. Di navbera 1986 û 1996an Öcalan bi tundî rexne li hevjîna xwe Kesîre Yildirim (Fatima) dikir û wê weke "marê zer", "xayin - ajan" dida naskirin. Lê di pirtûka xwe a dawî de "Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk" de, Öcalan dixwaze ku careke din dosya Kesîre Yildirim vebe û piştî ewqas sal ji tawanbarkirinê, hin gumanên xwe tîne zimên û dibêje: "Dibe ku Kesîre ne xayin be." Ango ev nêzîkî 30 sale ye Öcalan hezkiriya xwe û hevjîna xwe a berê pîs û ne baş dida nîşan dan û me bi çavên Öcalan li (Fatima) dinêrî, lê me ji xwe nedipirsî; çima em li Kesîre jî guhdar nakin, ka ew çi li ser Öcalan dibêje? Ev 30 sal in Fatima çima bêdeng e û tu gotinek, ne baş ne xerab, li ser Öcalan ne gotiye. PKKê gelek kesên jê veqetiyane kuştin, çima Kesîre sax hiştine tevî ewqas tawanbarê Öcalan? Helbet gelek tişt li cem wê li ser Öcalan hene, derbarê nêzîkatî û peywendiyên wî ê bi jina re. Bi wateyeke din; dema ku nêrîn û ramanên Öcalan derbarê jinê de dibin prensîb û pîvanên PKKê ji bo azadiya jinê, divê em li şêweyên nêzîkatiya Öcalan bi diya wî û bi hevjîna wî a berê re vegerin û ji nûve binirxînin.

Propagandeya PKKê ya demagojîk di derbarê jinan de gihîştiye asta herî bilind, ta qûnaxa ku PKKê jina Kurd weke alava propaganda jî bi kar tîne. PKKê xwe weke partiya azadiya jinê, bi şêweyekî dîrekt yan ne dîrekt, dide nas kirin. Niha, hemû kes, medya Kurd û a navneteweyî jî di nav de, wêneyên şervanên jin yên Kurd dibînin şok û dilxweş dibin ku PKKê ewqas partiyeke laîk, nûjen û demokrat e ku heta vê qûnaxa bilind rê li pêşiya jina Kurd vekiriye. Ev jî, encameke pir normal e, dema wêneyên şervanên jin yên xweşik tên hilbijartin û di raport û nûçeyan de têne bikaranîn. Dema medya PKKê ewqas wêneyên keç û jinên Kurd yên şervan bikartîne, armanc jê, ne ku pesnê jin û civaka Kurd bide, lê pesnê xwe weke partiyeke siyasî dide.

Jixwe PKKê dibêje: "Min jina Kurd anî nava jiyana siyasî û leşkerî tu partî di nava Kurdan û cîhanê de weke min ne kiriye". Ev jî ne rast e. Helbet rol û bandora PKKê heye, lê ne tenê PKKê rê li pêşiya jinê vekiriye û hemû partiyên din yên Kurdan rê li pêşiya jinê girtine û tu ked û rola wan nîne. Di salên 60 û 70î de, jina Kurd li Suriyê di nava jiyana partî û siyasî de bû. Kesayetiyeke weke Leyla Qasim ne ji nav PKKê derketiye.

Dema ku Kurd û medya cîhanê bi hezaran jinên di nava PKK-HPG-YPG...hwd, dibînin, dibên Cemîle Merkît "Seher" û Lamîa Baksî "Dr. Jiyan" bi sedan kadroyên jin ku bi destê PKKê, di nava PKKê de hatine kuştin jî bibînin. Divê bi hezaran jinên ku ji PKKê veqetiyane û reviyane bibînin. Jixwe êdî Kurd Cemîle Merkît, Lamîa Baksî û Benefş Mohemmed...hwd ji bîr kirine.

Cemîle Merkît, yekemîn jina ku di nava PKKê de bi şêweyekî hovane hate kuştin "tasfiye kirin". Ew jî, weke Kesîre Yildirim û Sakîne Cansiz ji damezrînerê PKKê bû. Cemîle Merkît, xwişka Yildirim Merkît e, ku ji sazkarên PKKê ye û di sala 1994an de li Romanya ji aliyê PKKê ve hatiye kuştin. Cemîle Merkît jina Alî Haydar Kaytan bû û navê wê yê Kod "Seher" bû, ducanî bû. Piştî kongereya PKKê a duyemîn di sala 1982an de, zaroka wê 6 mehî ji ber wê kirin û hate kuştin.

Lamîa Baksî "Dr. Jiyan" ku xwişka nivîskarê Kurd Mehmûd Baksî ye. Hemû berpirsên jin û mêr di nava PKKê de dizanin bê bi çi şêweyeke hovane hate kuştin.

Van rûpelên reş di nava PKKê de li ser asta binpêkirinên maf û kesayetî û hest û nerînên jinê, kesek newêre veke û pirsa rastiya azadiya jinê di nava PKKê de bilivîne. Ez gelek kadroyên jin yên berê di nava PKKê de bûn û ji rêxistinê veqetiyane, ne wêrin devên xwe vekin û hemû tiştên kirêt li hemberî jinê, li çiyê, Şamê û Lubnanê dihatin kirin, bînin ziman.

Ez jî baş nas dikim bê ev dosya, ev pirs, çiqas xeter in û bi metirsî ne, lê divê were gotin. Bere kesek nebêje: Ev ne dema van pirsan e. Em di nava şer de ne. Dema PKKê hemû kesên ji vê partiyê re bibêje; na, weke xayîn dibîne. Dema PKKê hemû Kurdên aligirên AKP, CHP, HAK-PAR, PDK, ENKS, PDK-Î... hwd xayîn dibîne. Dema PKKê ji mafê xwe dibîne "rexne" tawanbariya li kesayetiyên weke Îsmaîl Beşîkçî dike, ma gelo qey pir zêdeye dema mirov bixwaze dosya jinê di nava PKKê de têxe binê ronahiyê?

Divê Kesîre Yildirim biaxiv e. Divê hemû kardroyên jin yên ji PKKê qut bûne biaxivin. Ji bêdengiyê re; êdî bes e.

## Partiyeke din jî dest bi xebata çekdarî kir

# Rojhilat li benda guhertinan e

ESKENDER CEIFERÎ

**BERIYA** çend salan dema ku Ebdulla Muhtedî sekreterê Komeleya Zehmetkêşên Kurdistana Îranê behsa xebata partiya xwe dikir, digot Komele niha di warê rêxistinî û siyasî de xebatên xwe dimeşîne. Lê vê carê Komele behseke cuda dike. Ew dibêjin dibe ku rewş were guhertin û ji ber vê, em hêzên xwe dibin sînorên Rojhilatê Kurdistanê.

Beriya wan, Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê jî hêzên xwe biribûne sînor û hin navçeyên navxwe yên Rojhilat û ragihandin ku eger şer jî çê bibe, ew amade ne. Çendîn şehîd jî di pevçûnên xwe bi Sipaya Pasdaran re dane û gelek ziyan li Sipayê dane. Navê projeya xwe jî weke Rasan yan jî Rabûn binav kirine.

Hizba Demokrat a Kurdistanê HDK ku sala 2006'an ji PDKÎ cuda bûn, piştî PDKÎ hêzên xwe birine ser sînor. Lê ti pevçûn di navbera wan û hêzên Îranê de çê nebûne.





**Hemû ev bûyer di heyama du salan de çêbûne.**

Muhtedî di nameyekê de ji bo 15'mîn kongreya partiya xwe dibêje heya niha derfetên ku bo Kurdên beşên din çê bibûn ji bo Rojhilat çênebibûn lê emê bi piştgiriya xelkê Kurdistanê, vê rewşê bi dawî bînin û girtin, kuştin û darvekirina Kurdan bi dawî bînin û sîstemeke din li wî welatî ava bikin. Li gor wî Tramp weke Obama ji Îsraîl û Erebistanê naxwaze li hemberî Îranê nerm bin belkî wê li dijî derkeve.

Hemû partiyên nasyonalîst yên Rojhilat û di nav de jî Komeleya Zehmetkêşên Kurdistana Îranê û Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê dibêjin Kurd yek netew e û Kurdistan jî yek welat e û divê partiyên Kurdî li ser bingeha berjewendiya netewî tevbigerin.

Partiya Komeleya di bin fermana Muhtedî de jî weke aliyên din yên bi bandor li Rojhilat, piştgiriyê didin refrandom û serxwebûna Başûrê Kurdistanê. Muhtedî dibêje rewşa Îraqê wê yekê dixwaze ku divê ev welat parçe parçe bibe û em piştgiriyê didin serxistina refrandoma Kurdistanê û pêwîst e hemû gelê Kurd ji bo serxistina wê projeyê kar bike û di rapirsiyê de dengê erê bidin.

Kurdên Rojhilat, Komeleya Zehmetkêşên Kurdistana Îranê nasyonalîstir û netewexwaztir ji aliyên din yên Komele binav dikin û ji bo vê gotinê jî daxuyaniya Ebdulla Muhtedî sekreterê giştî yê wê partiyê bi şahîd tînin ku ragihandiye Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD bi hevkariya Beşar Esed dest daniye ser Rojavayê Kurdistanê. Muhtedî dibêje PYD di hewldanên xwe de biserneketiye û partiyên ENKS'ê û hemû Kurdên Rojava bi wan re nîn in.

Dema ku berpirsên Komeleya Zehmetkêşên Kurdistana Îranê bi partiyên perçeyên din yên Kurdistanê re dicivin, ji Komeleyên din netewexwaztir derdikevin û hin xwe ji karkeran dûr û ji nasyonalîstan nêzîk dikin. Dema bi partiyên Bakurê Kurdistanê re dicivin, giringiya xebatên li ser xeta Kurdistanî, azadîxwaz û netewî li Bakurê Kurdistanê tînin ziman û tevî tekezî li ser çareseriya siyasî, xebata çekdarî jî bê bandor nabînin.

Her du aliyên demokrat û Komele, xwe weke partiyên sereke yên wî parçeyê Kurdistanê dibînin ji ber ku endam û alîgirên wan li navxwe, ji yên din zêdetir in. Li gor wan ti partiyeke Rojhilat girîngiya avakirina eniyekê red nake. HDK dibêje her daxwaziyek ji bo hevkarî û pêkanîna eniyeke hevpar girîng e. PDKÎ jî heman tiştî dibêje û niha tenê ew sê partî, behsa şer dikin. Carna di du salên derbasbûyî de hêzên PDKÎ û Komeleya di bin fermana Ebdulla Muhtedî de bi hevparî pêşmergeyên xwe şandine navxwe.Ev çend sal in ku di navbera PDKÎ û Komeleya Zehmetkêşên Kurdistana Îranê de hevpeymanek hatiye îmzekirin ku neketibû warê bicîkirin û niha tê bicîkirin û weke hevpeymaniya çekdarî tê binavkirin.



# Hilbijartineke boykotkirî

Hilbijartinên serokkomariyê yê Îranê di roja 19'ê Gulana 2017'an encam didin. Di hilbijartinên îsal de 6 namzed bi navên Hesen Rûhanî, Mihemedbaqir Qalîbaf, Seyîd Îbrahîm Reyîsî, Îshaq Cehangîrî, Seyîd Mistefa Mîrselîm û Seyîd Mistefa Haşimîniya hevrikiyê dikin ku weke hilbijartinên berê, ti yek ji wan Kurd nîn in. Di hilbijartinên vê derê de, Hesen Rûhanî û Îbrahîm Reyîsî li ser bidestxistina dengên Kurdan hevrik in. Herî kêm dikarin dengên nêzîkî 2 milyon dengderên Kurd ji xwe re misoger bikin. Di hilbijartina berê de, Rûhanî piraniya dengên Kurdên Rojhilat bidest xistibû. Lê li gora ku çalakvan dibêjin Rûhanî sozên ku dabûn Kurdan, bicî neanîne lewma dibe ku Kurd vê carê wek berê bi germî pêşwaziya Rûhanî nekin.



Mesûd Kurdpûr çalakvanê Kurd di vê derbarê de dibêje baykotkirina hilbijartinên serokkomariyê û yên gund û bajaran ji aliyê hin partî û aliyên siyasî ve, vê rastiyê nîşan dide ku Kurdistan ji hin tiştan bêpar e. Lê Komara Îslamî jî di hember de kiryarên xwe hene. Ev, cara yekemîn e ku zêdetirî 90 ji sedî kesên ku navên xwe ji bo endamtiya civatên bajar û gundan tomar kiribûn, mafê berendamtiyê distînin. Bi vê yekê jî Komara Îslamî dixwaze biryara boykotê ya aliyên siyasî bê bandor bike û ji civaka cîhanî re bêje hilbijartinên me bi rengekî demokratîk bi rê ve diçin.

Ev nêzîkî sê hefteyan e ku xebat û propagandeyên hilbijartinên serokkomariya Îranê û yên gund û bajaran destpê kirine û li Rojhilatê Kurdistanê li her çar parêzgehên Sine, Urmiye, Îlam û Kirmaşanê jî hevrikiyên namzetan germ û gurr bûne û her yek hewl dide bi dayîna sozên cuda, dengên Kurdan ji xwe re misoger bike. Îbrahîm Reyîsî ku hin kes li Rojhilatê Kurdistanê pişta wî digirin, heman ew kes e ku 18 sal bûn di dezgehên dadwerî yên Îranê de bi postên cuda fermana girtin, darvekirin û sirgûnkirina gelek Kurdan ji aliyê wî ve hatiye dayîn yan jî ferman di bin destên wî re derbas bûne.

Di derbarê berendamên hilbijartina serokkomar de nerînên cuda hene. Aliyên Kurdî dibêjin kî bê hilbijartin, lê ew qet nikare mafê Kurdan bide û pirsgirêk, tenê bi jinavbirin û guhertina sîstemê çareser dibe. Xalid Tewekulî mamostayê zanîngehê li ser berendamên serokkomariyê dibêje herqasî ku Mehmûd Ehmedînijad hate redkirin, lê dîsa jî eniya wî ya bi navê Miyanrewan di rêbaza wî de ne û pirsgirêka wan tenê bi Ehmedînijad re bû. Ew niha heman gotinên wî dikin lê bi zimanekî din. Pirsgirêka reformxwazên Fars jî guhertina serokkomar nebû. Ji ber vê jî wan hewl da ku selahiyet jê re bê wergirtin û pişt re di derfetên ku ew dixwazin çê bikin de, desthilatdariya Îranê rexne bikin.



Îbrahîm Reyîsî girîngiyeke taybet dide dengê Kurdan. Ji bo vê jî neviyekî Simkoyê Şikak, ku di dîrokê de wek rêberekî Kurdan tê nasîn, kire berpirsê xebat û propagandeya xwe ji bo serokkomariya Îranê li parêzgeha Urmiyê. Reyîsî dixwaze ji navdarên Kurd û nasiyonalîzma Kurdî mifahê bistîne û bi vî karî, Kurd deng bidin wî. Rojnamevan û çalakvanên Rojhilatî dibêjin Arman Simko neviyê Simayîl Axa jî mîna malbata Gargarîn, ku neviyekî din yê Simko ye, demeke dirêj e xwe nêzîkî hikûmeta Îranê kirine ji ber wê jî di nav Kurdên Rojhilat de zêde nayên hezkirin.

Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê PJAK dibêje eger Îran derfetê ji bo guhertinan pêk bîne emê beşdar bibin. Lê dibêje pêwîst e xelk beşdarî hilbijartinên encumenên gund û bajaran bibin. Di hember de partiyên din ên weke Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşanên Kurdistana Îranê, Komele-Rêxistina Kurdistanê ya Partiya Komunîst a Kurdistana Îranê, Komeleya Zehmetkêşanên Kurdistanê, Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, Hizba Demokrat a Kurdistanê û Sazmana Xebat, PJAK'ê bi fermî nas nakin û her du hilbijartinan boykot dikin. Di hemû hilbijartinên wî welatî de Eniya Yekgirtî ya Kurd li Rojhelatê Kudistanê û Îranê, take aliyê Kurdî ye ku beşdarî proseyê dibe. Lê ew enî bi xwe girêdayî reformxwazan e û dengên xwe jî didin kandîdên reformxwaz.

# Heftiyek mafên mirovan li Rojhilatê Kurdistanê

Jineke ciwan a xelkê Merîwanê bi navê Dunya Dadguster ku temenê wê 22 sal bû, ji ber pirsgirêkên malbatî xwe darve kiriye û dawî bi jiyana xwe aniye. Li gundê Serhoye li Sine jî welatiyekî 60 salî bi navê Kerîm Cemşîdî xwe bi darve kir. Li gor çalakvanên mafên mirovan, salane bi dehan keçên Kurd ji ber zewaca bi zorê û zilam, ji ber sedemên maddî dawî li jiyana xwe tînin.

Di raporên çalakvanên komonîst de hate ragihandin ku di salekê de li Rojhilatê Kurdistanê 3 hezar û 544 caran mafên karker û kedkaran hatine binpêkirin. Gelek karker ji ber bûyerên kar mirine û 22 karker û parêzvanên mafên karkeran ji aliyê hêzên Îranê ve hatine girtin.



Elîmihemed Mihemedî helbestvan û çalakvanê siyasî yê xelkê Îlamê ji ber nivîsandina helbestekê li ser hilbijartinên Îranê ji aliyê hêzên ewlehiya Îranê ve hate girtin. Sipaya Pasdaran ku li ser wî gilî kiribû, ragihandiye ku helbesta wî ya di derbarê hilbijartinên Îranê de bêrêzî bi îmamê heştem yêşîeyan bûye.

Piştî lidarxistina rêwresmên di derbarê 1'ê Gulanê Roja Karkeran de keçeke Kurd bi navê Sara Kemanger li Sine hate girtin ku heta niha nayê zanîn li ku derê girtî ye û sedemên girtina wê çi ne.

Li Kirmaşanê 5 welatiyên bi navên Erselan Ehmedî, Dilsoz Mihemedî, Ferîd Ehmedî, Soran Ehmedî û Coneyd Hîdayetî bi danîna kefaleta 200 milyon Tumenî hatin berdan ku beriya heyamekê bi sedemên siyasî hatibûn binçavkirin.



Li gundê Bizmûrtê yê Şinoyê heşt Kurdên bi navên Kemal Husêndûst, Xusro Hemko, Mubîn Hemko, Reşîd Hemko, Celal Bêşîr, Azad Zengî, Kerîm Aşewan û Wesîm Hemko bi tometên siyasî hatin girtin. Temenê biçûktirîn kes ji wan 16 sal e.

Heşt welatî bi hêceta çêkirina malan li nav zewiyên bi ser îdareya çavkaniyên xwezayî li navçeya Newsûdê ya bajarê Pawe hatin girtin. Girtina wan di demekê de ye ku wan, tapoya erdên xwe jî hene.

Li Îranê 90 nûgîha li benda darvekirinê ne û li hember wê rêxistina Mafê Mirovan a Neteweyên Yekbûyî ji Komara Îslamî xwast darvekirina ciwanên ku temenê wan kêmî 18 salan e bi dawî bike û mafên mirovan binpê neke.

Li gundê Sêçomanê li nêzîkî bajarê Pîranşarê yê Rojhilatê Kurdistanê, komek hespên kolberan ji aliyê hêzên Îranê ve bi fîşekan hatin kuştin. Sikitandina wan hespan di demekê de ye ku ew hespbên bar bûn lê tenê ji ber ku hespên kolberan bûne ji aliyê Pasdarên Îranî ve hatin kuştin.

Li Abdanana Îlamê ciwanekî 28 salî li ber deriyê saziyeke koçeran ji aliyê Sipaya Pasdaran ve hate kuştin.

Teqîna mayînan li navçeyên cuda yên Rojhilatê Kurdistanê berdewam dike û li Seqizê ji ber teqîna mayînekê welatiyekî Kurd lingekî xwe ji dest da. Li Qesr Şîrînê welatiyekî ji ber teqîna mayînê hest û şiyana bihîstinê ji dest da. Li Şinoyê kesek û li Serdeştê jî kesek di encama teqîna mayînê de bi tundî birîndar bûn.

## Çarenivîsa pêwendiyên DYA û PYDê ne diyar e

# Hevkariya DYAyê dê berdewam bike?



### Rejîma Sûriyê ala xwe li Rojava bilind kir

Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) ji destpêka şerê Sûriyê û vekişîna rejîma Sûriyê ji herêmên Kurdî û vir ve kontrola Rojavayê Kurdistanê di destê xwe de digire. Herwiha ji bilî hêzên Kurdî li gel hemû aliyan pêwendiyan dirûst dike. Nêzî 10 hezar Pêşmergeyên Roj li Herêma Kurdistanê ne ku niha jî di çeperên şer de ne, vegera wan ya bo Rojava asteng dike û gefên 'destpêkirina şerê birakijûyê' dixwe, lêbelê PYD di rêkeftinên xwe yên li gel rejîma Sûriyê berdewam e û li herêma Efrînê piştî bi salan rejîma Sûriyê ala xwe bilind kir. Hat zanîn ku PYD, rejîma Sûriyê û Rûsyayê li bajarê Efrînê yê Rojava civiyan û rêkeftinek pêkanîn. Li gor agahiyên berdest her sê aliyan bo operasyonên hevbeş li Heleb û Îdlîbê rêkeftin û di vê çarçovê de YPG û rejîm li bejahiya van herêman wê pêş de biçin û Rûsya jî dê alîkariya hewayî bide. Herwiha di encama vê rêkeftinê de leşkerên rejîmê û endamên îstixbareta Sûriyê, beriya operasyonê li Efrînê bicih bûn û piştî bi salan ala Sûriyê li herêmên Kurdî bilind bû.



MURAT ÖZDEMİR

Li Rojavayê Kurdistanê piştî êrişên Tirkiyê û pevçûnên li ser sînor, bi zelalî derket holê ku bêyî DYA Rojava di bin metirsiyê de ye û nikare li ser lingên xwe bisekine. Herçiqas DYA û Rûsyayê hêzên xwe li ser sînor bicihkiribin jî tê ragihandin ku hevsengiyên li herêmê zû digûherin û dibe ku ev ne demdirêj be û destekftiyên li Rojava di bin metirsiyê de ne.

Herwiha tifaqa DYA ya li PYD/YPG jî asta leşkerî derbas nekiriye û heta niha ji bo ti civînên navdewletî PYD nehatiye vexwandin. Tê diyarkirin ku ji ber vê yekê têkiliyên DYA yên bi PYD re ne stratejîk in û eger PYD xwe ji PKK dûr nexîne wê ev hevkariya leşkerî jî bikeve bin rîskê û Rojavayê Kurdistanê dê ji destwerdanên welatên derdorê re vekirî bimîne.

**DYA hevkariya xwe bi şertekê ve girêdide**

Tê çaverêkirin ku piştî civîna Serokkomarê Tirkiyê Recep Tayyip Erdoğan û Serokê DYA Donalp Trump ku wê di 16-17'ê vê mehê de bê li dar xistin, di derbarê Rojava de biryarên nû wê werin girtin. Niha jî tê nîqaşkirin ka DYA wê piştevanî û alîkariya xwe berdewam bike an na. Herwiha tê ragihandin ku DYA wê şertê qutkirina pêwendiyên bi PKK re deyne ber PYD û bi vî awayî dê polîtîkaya xwe ya nû pêk bîne.

**Gelo wê piştevaniya DYA berdewam bike?**

Her çiqas DYA di Rojava de baregehên xwe ava kiribin û hêzên xwe li ser sînor bicihkiribin jî tê ragihandin ku ne diyar e ka wê ev alîkarî berdewam bike an na. Ji ber ku hevsengiyên li herêmê zû digûherin. Niha operasyona rizgarkirina Reqayê birêve diçe û DYA wê operasyonê jî ligel HSD birêve bibe. Lêbelê tê gotin ku bandora PKK ya li ser Rojava metirsiyê li ser herêmê ava dike û dibe ku hevkariya DYA bi berdewamî nebe. Tê gotin ku DYA wê şertê qutkirina pêwendiyên bi PKK re deyne ber PYD û li gorî vê yekê wê nexşeya xwe diyar bike.

Herwiha tê ragihandin ku di nava PYD/YPG de jî nîqaş hene. Tê gotin ku di nava PYD û YPG de aliyek ji bo pêşeroja Rojavayê Kurdistanê pêşniyar dikin ku YPG/PYD têkiliyên xwe yên bi PKK re bi temamî qut bike û tenê li ser Rojava bisekine. Ew aliyê di vê nêrînê de di wê baweriyê de ne ku têkiliyên bi PKK re metirsiyê li ser Rojava ava dike û dibe ku DYA jî ji ber van têkiliyan piştevaniya xwe qut bike. Herwiha piştî êrişên Tirkiyê yên dawîn jî hat dîtin ku bêyî piştevanî û parastina DYA metirsî û talûkeya ji destçûyîna destkeftiyan heye.

**"DYA, dev ji YPG bernade"**

Pîsporê Navenda Lêkolînên Stratejîk a Rojhilata Navîn (ORSAM) Oytun Orhan li ser avakirina herêma ewle li Rojavayê Kurdistanê, ji Basê re axivî û ragihand ku dibe Amerîka li hemberî rêkeftina Tirkiye, Îran û Rûsyayê hemleyê bike û Rojava bike herema ewle. Orhan wiha dibêje: "Eger 4 herêmên li Sûriyê hatine avakirin ji balafirên Amerîkayê re qedexe bin, dibe ku Amerîka jî li wan heremên di bin kontrola YPG de herêmeke ewle ava bike. Lêbelê ev yek ne hêsan e. Ji ber ku divê Amerîka li vê deverê di heman demê de 'asîmanê ji firînê re qedexekirî' jî ava bike û wê pêwistiya wê bi qada hewayî ya Tirkiyê û baregeha Încîrlîkê hebe û ev jî pêkanîna vê yekê dijwar dike. Piştî hevdîtina Erdoğan û Trump wê li ser pêşeroja YPG biryar bên dayîn. Lêbelê DYA dev ji YPG bernade."

**"Pêwendiyên DYA û PYD ne stratejîk in"**

Encûmena Niştimaniya Kurd li Sûriyê (ENKS) jî ku ofîsên wan yên li Rojavayê Kurdistanê ji aliyê asayîşa PYD ve hatin girtin ragihand ku ew ê ofîsên xwe hemûyan vekin. Serokê ENKS li Tirkiyê Osman Milo di derbarê geşedanên dawîn de ji Basê re axivî. Milo li ser rêkeftina Îran, Tirkiye û Rûsyayê diyar kir ku komên opozîsyonê ev yek qebûl nekirine û bicihkirina wê jî ne diyar e û wiha got: "Bêyî liberçavgirtina îradeya xelkê Sûriyê, bicîkirina rêkeftinan zehmet e."

**"PYD bazirganiyê bi meseleya Kurd dike"**

Milo herwiha li ser daxwaza 'asîmanên Rojava yên ji firînê re qedexekirî' jî destnîşan kir: "Ji bo cîhan daxwazên Kurdan li ber çavan bigire divê hêzên Kurdî helwesta xwe bikin yek û bi yekdengî bangî cîhanê bikin. Pêwendiyên Amerîka û PYD ne stratejîk in. PYD li Efrînê bi Rûsyayê re ye, li Cizîrê bi Amerîkayê re ye, li Şengalê bi Îranê re ye. Encamên vê siyasetê wê çi sudê ji miletê Kurd re neyîne. PYD bazirganiyê bi meseleya Kurdî dike."



### Her sê welatan li ser herêmên 'bêpevçûn' li hev kirin

Tirkiye, Îran û Rûsya ku serpereştî û çavdêriya hevdîtinên Astanayê dikin, ji bo avakirina 4 herêmên 'ewle' li Sûriyê rêkeftin. Li gorî rêkeftinê tevahiya bajarê Îdlîbê, bejahiya Lazkiyê, Heleb, Hûmûs û Hemayê, herêma Şam/rojhilatê Gutayê û bajarên Deraa û Kuneytra weke herêmên ewle hatin destnîşankirin. Di van herêman de wê xalên kontrol û çavdêriyê yên hêzên rejîm û opozîsyonê bên avakirin. Herwiha tê ragihandin ku dê leşkerên her sê welatên pêşengên civînê, Tirkiye, Rûsya û Îranê li van herêman tevbigerin û çavdêriyê bikin. Rejîma Sûriyê jî piştevaniya xwe ji vê rêkeftinê re ragihand. Lêbelê opozîsyona Sûriyê li dijî rêkeftinê nerazîbûna xwe anî ziman û ragihandin ku ewê vê rêkeftinê nas nekin.



### Li Tebqayê ber bi dawiyê ve

Operasyona kontrolkirina Tebqayê berdewam dike. Hêzên Sûriya Demokratîk ku YPG pêşengiya wê dikê û hevpeymaniya navdewletî piştevaniyê didê, ji sedî 95'ê bajarê Tebqayê ji DAIŞê paqij kiriye. Li gor çavkaniyên herêmê di nava bajêr de pevçûnên dijwar rû didin û di demeke nêz de wê bajar were kontrolkirin. Tebqa xwedî girîngiyeke stratejîk e û tê ragihandin ku bi girtina Tebqa û bendava Tebqayê wê xeleka li dor Reqayê teng bibe û wê berê hêzên HSD bi temamî bikeve 'paytexta' DAIŞê. Rewangeha Mafên Mirovan a Sûriyê ragihandibû ku DAIŞê piştî rêkeftina ligel HSDê ji Tebqayê vekişiya. Lêbelê HSD ev red kiribû. Li hêla din hat zanîn ku DYA karwanekî leşkerî ku ji 48 wesayîtên zirxî û 250 leşkeran pêk tê bo alîkariya YPG şandiye Rojava.



JAN DOST

## Destanên Mem û Zînê

Ji ber ku binyada Mem û Zînê evîndarî ye, Ehmedê Xanî giranî daye destanên evînê û navê gelekan ji wan aniye ziman. Ji van destanên ku di kitaba kurdan "Mem û Zîn"ê de cih digrin ev heştên li jêr in:

Mihr û Mişterî, Wamiq û Ezra, Leyla û Mecnûn, Yûsif û Zuleyxa, Weys û Ramîn, Bîjen û Menîje, Ferhad û Şêrîn û Şêxê Senanî.

Mihr û Mişterî: Çîroka du evîndaran e, ku helbestvanê farisî Essarê Tebrîzî destana wan nivîsiye. Xanî li ser hevaltiya Memo û Tacdîn wisa dibêje:

Ew yarê ji dil ne serserî bûn
Reh şubhetê Mihr û Mişterî bûn

Wamiq û Ezra: Çîroka du evîndarên navdar e. Şairê îranî Unsurî ew bi helbestî nivîsiye.

Leyla û Mecnûn: Navdartirîn çîroka evînê li rojhilatê ye, bû jêdera gelek destanên evînê û bi her zimanî!

Yûsif û Zuleyxa: Çîroka Pêxember Yûsif e, ku dilê jina mezinê Misrê dikevê. Gelek şairan tevna vê destanê ristine. Di kurdî de jî Selîmê Hêzanî destanek nivîsî, wî di destana xwe de şopa Mem û Zînê ajot. Tiştê balkêş di vê destanê de ku jin li pey mêr diçe û dil dikevê! Lewra sofiyan ew mîna mînaka evîndariya rast hilbijartine, çiko ji bo jinê şerm e evîna xwe kifş û eşkere bike, lê dema evîn hedê xwe derbas dike û êdî nema di dil hiltê, jin jî nema dikare veşêre! Ji ber ku seydayê Xanî jî qenc bala xwe daye vê destanê, li ser zimanê Memo wisa ji Zînê re dibêje:

Geh geh çi dibit wekî Zuleyxa
Pirsa min bikî tu ey şekerxa?

Weys û Ramîn: Ji kevintirîn destanên evînê ye, şairê îranî Fexreddînê Gurganî ew berî hezar salî nivîsiye.

Bîjen û Menîje: Di Şahnameya Firdewsî de destana wan heye, Bîjen kurê Gêw e, dil dikeve keça qiralê tûraniyan (tirk) û dikeve hepsê ji bo evîna xwe. Çîroka wan dûr û dirêj e. Xanî her çi behsa Menîje bi nav nake, lê behsa evîndarê wê Bîjen dike:

Ev bilbilê can di mehbesa ten
Maye bi tenê misalê Bîjen

Ango ev canê ku mîna bilbilekî ye, wekî Bîjen bi tenê di zindana bedenê de ma ye!

Tiştê balkêş di evîna Bîjen û Menîje de ew e girtina Bîjen û mana wî ya di binê bîrê de (ku Menîje xwarina wî dianî) lewra Xanî ev îşareta han da.

Ferhad û Şêrîn: Ji xwe ew çîrokek naskirî ye, lê di edebiyata farisî de bi navê Xusro û Şêrîn tê nas kirin. Dibêjin ku Ferhad kurd bû û Şêrîn ermenî! Ji ber ku ev evîna di navbera sê kesan de bû, Xanî her ku behsa Ferhad û Şêrînê dike, behsa kesê sêyem jî ango (Xusro Perwîz) ku mêrê Şêrînê bû jî dike. Wisa jî Melayê Cizîrî ku dibêje:

Tenê Ferhad dizanit lezzetê işq
Ku wî can daye Şêrînê, ne Perwîz!

Şêxê Senanî: Çîroka Şêxê ku di xewnê de keça qiralê ermenan dibîne û dil dikevê, dide pey xewna xwe û dev ji dînê îslamê ber dide û dest bi vexwarina meyê dike, berazan diçêrîne û hdw. Ev çîrok wekî destan Feqiyê Teyran nivîsiye, lê berê di berhemên klasîk (erebî û farisî) de heye. Xanî ew bi nav nekiriye lê işaret da ye, ew dibêje:

Şêxê we ku pênce hec bijarî
Dîn kir te ji bo keça kufarî!

Ew Şêxê ku pêncî carî çûye heccê, Şêxê Senanî bi xwe ye. Çiku Feqiyê Teyran jî û Ferîdeddînê Ettar jî dibêjin ku Şêxê Senanî pêncî carî çûye heccê, Feqî dibêje:

Pêncî hec û pêncî tewaf
Sewm û selat û i`tiklaf
Bexşiş kirin min bêxilaf
D`mizgîniya bişaretê

Şairê farisî Ettar ku yekem kes bû wekî destan çîroka evîna Şêx û keça ermenî nivîsîbû, dibêje ku wî nêzîkî pêncî carî hec kiribû!

Ev bûn bi kurtî destanên ku Xanî di Mem û Zînê de îşaretî wan kiriye. Wî behsa evîndariya rojê û kulîlka Lûleperê (Nîlofer) jî kiriye, îşaretî hezkirina Belqîs û Pêxember Silêman jî kiriye, lê ji ber ku ew ne zêde meşhûr in me ew paşguh kirin.

## Li Almanyayê nîqaşên hemwelatiyê

# "Tercîha Kurdan hemwelatîtiya Almanyayê ye"



DERYA KILIÇ

Di referanduma Tirkiyeyê ya 16'ê Nîsanê de li Almanyayê rêjeya dengên erê %63'ê bi serket. Piştî serkeftina dengên 'Erê' pêşiya hilbijartinên Almanyayê yê meclîsê nîqaşa hemwelatîtiya dualî bûye mijara kampanyayên hilbijartinê. Piştî raporta neyînî a çavdêrên navnetewî ku digotin "Referandum ne li gor esasên Konseya Ewropayê ye" destê siyasetmedarên Almanî xurttir kir ku bi çavekî neyînî li têkiliyên Tirkiye û Yekîtiya Ewropa dinêriyan. Kurd, van nîqaşan bi nêzîkî dişopînin. Milyonek û 3 hezar Kurd li Almanyayê dijîn. 8 hezar ji van Kurdan jî hemwelatiyê Tirkiyeyê ne.

### Berdevkê civaka Kurd a Ewropa Tanriverdî:

**Piraniya Kurdan tenê hemwelatiyê Almanyayê ne**

Berdevkê civaka Kurd a Ewropa Tanriverdî di çarçoveya van nîqaşan de rewşa Kurdan nirxand. Kurdên ji Tirkiyeyê hatine tenê hemwelatiyê Almanyayê ne. Nifşa nû jî tenê hemwelatiya Almanyayê hildibijêre.

Tanriverdî destnîşan kir ku hinek Kurd jî hemwelatîtiya dualî diceribînin. "Piraniya Kurdan jî hemwelatîtiya Almanyayê hildibijêrin. Ji pasaportên Tirkiye, Îran, Suriye û Îraqê hez nakin. Ev jî dibe sedem ku pasaportên Almanyayê wergirin. Zû entegreyî civaka Almanyayê dibin û bi Almanan ve bê pirsgirêk dijîn. Nifşa Kurdan ya nû jî hemwelatîtiya Almanyayê hildibijêre."

### Serokê Komeleya Piştevaniya Avrupa yê HAK-PAR Fettah Timar:

**Bi çavên biyaniyan li xwediyê du pasaportan dinêrin**

Serokê Komeleya Hemahengiyê ya Avrupa yê HAK-PAR Fettah Timar hemwelatîtiya dualî ji rojnameya me re nirxand. Timar dibêje: "Ev 30-40 sal e li Almanyayê tekoşîna pêkvejiyanê tê kirin. Gilî û gazinin Kurdan di vê mijarê de hene. Ez li hember standina hemwelatîtiya dualî me. Çi dibe bila be lê bi çavê biyaniyan li xwediyê hemwelatîtiya dualî dinêrin. Ji berê de li Almanyayê polîtîkaya vederkirinê (dişlama) heye. Kesekî 60 sal e li Almanyayê dijî hemwelatê hevpar yê Almanyayê ye."


### Doç Dr. Murat Erdoğan:

**"Serokê Eyaletê xwediyê hemwelatîtiya dualî jî heye"**

Di derbarê mijarê de nêrîna, Doç. Dr. Murat Erdoğan wiha ye: "Nîqaşên hemwelatîtiyê ji berê de hene û hîna jî didomin. Ew kesên li Almanyayê tên dinyayê û hin şert û mercan bi cîh tînin, dibin xwediyê hemwelatîtiya dualî. Li Almanyayê bi awayekî giştî hemwelatîtiya dualî tê dayîn.

Ji bo Tirkan di vê meselê de kêşe derdikevin. Hemwelatîtiya dualî ya dewletên din nabe arîşe. Li Almanyayê serokê eyletekê hemwelatîtiya dualî heye û ti kes dengê xwe nake."

Erdoğan balê dikşîne ku Tirkiye di vî warî de nikare mueyîdeyekê pêk bîne û wiha pê de diçe:




> Di referanduma Tirkiyê a 16'ê Nîsanê de li Almanyayê rêjeya dengên erê %63'ê bi serket. Piştî serkeftina dengên 'Erê' pêşiya hilbijartinên Almanyayê yê meclîsê nîqaşa hemwelatîtiya dualî bûye mijara kampanyayên hilbijartinê.

"Tirkiye çi jî bêje bêwate ye û bi kêrî tiştekî nayê. Tirkiyê 'Karta Şîn' da wan kesên ku ji hemwelatiyê derketine û dikarin bi vê kartê têkevin welêt û jê derkevin û herwiha dikarin mafên xwe yên siyasî bikar bînin. Divê dewleta Tirkiyê plan û polîtîkayên xwe li gorî berjewendî û pêwistiyên welatiyên xwe ava bike."

**Partî û civaka Alman çi dibêjin?**

Li rapirsiyan li Almanyayê ji sedê 58'ê welatiyan li dijî hemwelatîtiya dualî ne. Rêjeya kesên ku vî mafî diparêzin jî ji sedî 35 e. Di heman rapirsiyê de ji sedî 64'ê welatiyên Alman dixwazin ku muzakereyên endamtiyê yên Tirkiyê yên bi YEyê re bên rawestandin.

Beriya hilbijartinên di meha Îlonê de meseleya hewelatiya dualî li Almanyayê bûbû mijara kampanyayan. Siyasetvanên ku serkêşiya wan Partiyên Yekîtiya Xrîstiyanan (CDU/CSU) dikin, dawxaza dawîanîna hemwelatiya dualî dikin.

Partiya rastgir a populîst Alternatîf ji bo Almanyayê (AFD), piştî refernadûman li Tirkiyê banga dawîkirina hemwelatiya dualî kir û ragihand: "Kesên ku ne alîgirên azadiyê ne, divê biçin ew dera ku azadî lê hatibe astengkirin."

Li hemberî vê yekê jî Partiya Sosyal Demokrat (SDP), Partiya Çep û Partiya Keskan li dijî rakirina hemwelatiya dualî ne.

**Polîtîkayên YE çi bi xwe re tînin?**

Li gel vê yekê nîqaşên entegrasyonê jî hatin rojevê. Ji ber tê gotin ku di qanûnên guncaniyê bi kêr nehatine û serneketî ne. Ji ber vê yekê di vê heyama ku YE û Almanya di gelek waran de di lêgerîna entegrasyonê de ne, li gor rêzikên YE rakirina hemwelatiyê nayê wateya îhlalkirina mafan.

> "Piraniya Kurdan jî hemwelatiya Almanyayê hildibijêrin. Ji pasaportên Tirkiye, Îran, Suriye û Îraqê hez nakin. Ev jî dibe sedem ku pasaportên Almanyayê wergirin. Zû entegreyî civaka Almanyayê dibin. Nifşê Kurdan yê nû hemwelatiya Almanyayê hildibijêre."

### Li Almanyayê rewşa yasayî ya di warê welatîtiyê de çi ye?

Li Almanyayê yasaya ku hemwelatîbûnê bi xwînê ve girêdide û ji sala 1913'an mabû, ji aliyê hevpeymana Partiya Keskan û Sosyal Demokratan ve hatibû guhertin. Li gorî vê guhertinê di yasaya nû de cihê 'jidayûkbûnê' esas hat girtin û 'zarokên kesên ku herî kêm 8 sal in li Almanyayê ne û xwediyê destûra rûniştinê ne dikarin bibin welatiyên Almanyayê.' Maweya ji bo serlêdana welatîtiyê jî ji 15'an bo 8 salan hatibû guhertin. Bi çaksaziyeke di 2008'an de jî ji bo serlêdana welatîbûnê zanîna zimanê Almanî û derbaskirina testa welatîtiyê jî weke şert hatin destnîşankirin.



### Kî dikare bibe hemwelatiyê dualî?

Zarokên ku dayîk an bavê wan hemwelatiyê Almanyayê bin, bi jidayîkbûnê ve mafê welatîbûna Almanya an jî welatê din bidest dixin. Li gor yasaya ku ji 2014'an û vir ve di meriyetê de ye zarokên kesên ku ev 8 sal e li Almanyayê ne jî dikarin bibin hemwelatî. Piştî rakirina hemwelatîtiya dewletekê, zarokên 18-23 salî eger ev 8 sal in li Almanyayê bijîn an jî 6 salan li Almanyayê beşdarî dibistanê bûbin, heq e wan e ku herdu hemwelatîbûnên xwe biparêzin.





BEKİR SAYDAM

## Penaberên Tirkiyeyî û hemwelatiya dualî

Nîqaşên encama referanduma 16'ê nîsanê li Tirkiyeyê hê didomin. Di derheqê "Pergala Hikûmeta bi Serokkomariyê" li Almanyayê jî nîqaşên hemwelatiyên dualî tê kirin. Rojeva Almanyayê, Tirkiyeyiyên li Almanya xwedî welatiyê ne. Li Almanyayê bi qasî sê milyon û nîv hemwelatiyê Tirkiyeyê dijîn. Piraniya van hemwelatiyan jî xwedî hemwelatiya dualî ne, him welatiyê Almanyayê him jî yên Tirkiyeyê ne. Mijara nîqaşê dengên erê yên ji bo referanduma Tirkiyeyê ne. Ji bo referandumê li balyozxaneyan sindoqên hilbijartinê hatibûn danîn û encama vê dengdayînê jî li seranserê Almanyayê ji %63'ê bû. Encama referandumê li Almanyayê ji aliyê partiyên parêzker(muhafazakar) û partiyên nijadperest ve bû sedema nîqaşa hemwelatiya dualî. Sedema van nîqaşan, piştî ew çend salan jî cûdabûna hemwelatiyên Tirkiyeyê ji civak û jiyana civaka Almanyayê ye. Heçku, beşdariya hemwelatiyên Tirkiyeyê ji bo referandumê di binê %50 de ye. Ji bo dengdayînan diviyabû dengdêr li balyozxaneyan bêne tomarkirin. Bi giştî jî ev tomarkirin ji aliyê gelek kesan ve nedihat zanîn an jî hin aliyan ev biryar bi zanebûn nedihesiband.

Ne tenê li Almanya, li hemû deverên Ewropa hevalbendên AK Partiyê bi piştgiriya dewletê û Serokatiya Karên Olî bi awayekî xurt xwe bi rêxistin kirin. Ev kesîm di derheqê hilbijartin û xwe-birêxistin-kirinê de xwedî tecrûbe ye. Ji bo dengdayînê bi giştî çûn ser sindoqan. Sedema %63'ê bi serketina 'Erê' jî ev e. Ne ku hemwelatiyên Tirkiyeyê li Almanyayê ji jiyana Almanyayê bêpar in. Lê encamê rê li ber nîqaşên hemwelatiya dualî ya ji aliyên Îslamofobî û dijayetiya biyaniyan re vekir. Nîqaş ji aliyê parêzkerên hikûmeta federal, Yekîtiya Kirîstiyanan û hevalbendên vê partiyê yên Herêma Bavyerayê Yekîtiya Civakî a Kirîstiyanan ve hat rojevê. Ev biryar ji aliyê parlementerên her du partiyan û ji aliyê partiya tûndrew a parêzker 'Ji bo Almanyayê Partiya Alternatîf' ve piştgirî dît. Ev partî sedema cihêbûna hemwelatiyên Tirkiyeyî wek oldarên tund û neteweperest dibînin û dixwazin ku kanûna 'Hemwelatiya dualî' di sala 2000'î de bi piştgiriya saziyên sivîl ku ji aliyê Demokratên Civakî û Partiyên Kesk ve hatibû çêkirin bê rakirin.

Şansolyaya Almanyaya Federal Merkel, piraniya civakê, saziyên sivîl, lîberal, demokratên civakî, partiyên çepgir û piraniya şirîkê hikûmetê Kirîstiyanên Demokrat jî li hemberî vê daxwazê derdikevin. Ji ber ku îddîaya ku piraniya hemwelatiyên Tirkiyeyî ne li gor jiyana civaka Almanyayê dijîn ne rast e. Mîna hemû welatan li Almanyayê jî penaberan jiyaneke paralel ava kiriye. Heta hin ji wan jî ti têkilî bi Almanyayiyan re daneyniye jî. Lê belê bi piranî him oldar him jî kesên sekuler bi civaka Almanyayê re têkilî daniye û li gor jiyana civakê dijîn.

Bi taybetî Kurdistaniyên li Almanyayê dijîn di vê mijarê de serkeftî ne. Ji ber vê jî xwedî sempatî ne di nav civaka Almanyayê de. Hemwelatiyên Tirkiyeyê ji sala 1961'an ve bi penaberî diçin Almanyayê. Di ser pêvajoya penaberiyê de 56 sal derbas bû. Îro di parlementoyên Eyaletan de û him jî di Parlementoya Federal de gelek parlementerên Kurd û Tirk hene. Di medyayê de gelek penaber cih digirin. Milyonek karsaz, dikan û saziyên sivîl ji aliyê penaberan ve hatine avakirin û ev sazî jî di jiyana civaka Almanyayê de roleke girîng dileyîzin. Xebatên Îslamofobî û dijayetiya biyaniyan li hember hêzên Demokrat ên Almanyayê pûç derdikeve û guhertina kanuna 'Hemwelatiya Dualî' pêşiya hilbijartinên giştî yên di Îlona îsal de ne pêkan e.

## Ajokarên Kurd ên kamyon û tiran:

# Mîna berê qîmeta keda ajokarên kamyon û tiran nemaye!




Kurdên ku bi salan e wek ajokarên kamyon û tiran karê barkêşiyê dikin dibêjin ji ber şîrketên mezin yên barkêşiyê an nikarin bi rehetî ji xwe re kar bibînin an jî nikarin debara xwe pê bikin. Her wisa barkêşên Kurd dibêjin bihayê neftê jî rewşa wan zehmettir kiriye.



GÖNÜL GÜN

Di aboriya Tirkiyeyê de barkêşî ango neqliyat cihêkî girîng digire. Keda Kurdan wekî gelek sektorên din, di sektora barkêşiyê de jî zehf e. Kurdên ku bi salan e karê barkêşiyê dikin dibêjin piştî ku di karê barkêşiyê de şîrket/lojîstîkên mezin ava bûn ew, ne dikarin bi rehetî kar bi dest bixin ne jî heqê xwe baş digirin. Li gorî barkêşên Kurd, bihayê neftê jî barê wan zêdetir giran kiriye!

**"Em nikarin bi dilekî aram karekî bi dest bixin"**

Aydın Özviranê Kurdê Haymanaya Enqereyê ev panzdeh sal e ku di karê barkêşiyê de wek ajokarê kamyonê dixebite û ji bavê xwe hînî vî karî bûye. Özviran dibêje ew xwediyê kamyonekê ye û vê kamyonê an carinan bi xwe dajo an jî dide kiriyê. Özvîran destnîşan dike ku berê Kurdên Anatoliyayê ev kar dikirin, niha Kurdên Bakurê Kurdistanê zêdetir vî karî dikin.

Özvîran amaje dike ku di sektora barkêşiyê de piştî avabûna şîrketên mezin, ajokarên kamyon û tiran yên ne girêdayê şîrketan, bi zehmetî kar dibînin. Yên bi şîrketan re dixebitin jî tevî ku kedeke mezin didin, heqê xwe baş nagirin. Özviran rave dike ku şîrketên mezin zêdetir pere qezenc dikin û wiha pê de diçe, "Mîna berê qîmeta keda ajokarên kamyon û tiran nemaye. Em nikarin bi dilekî aram karekî bi dest bixin. Ger karekî bi dest bixin jî vê carê heqê xwe baş bi dest naxin."

**"Min bi taybet zerzewat û fêkî û amûrên tibî biriye Herêma Kurdistanê"**

Barkêşê Kurd dibêje ger li Enqereyê kar hebe li Enqereyê dixebitin an jî diçin derveyî bajêr û her wisa diçin derveyî welêt jî. Barkêş Özviran diyar dike ku gelek tiştan -zerzewat û fêkî bigire heta amûrên înşaatê- bar dikin dibin an jî tînin. Li gor sezonên cotkarî û hin sezonên pîşeyên din, karê wan jî bi rê ve diçe. Özviran dibêje niha ji Çukuovaya Edeneyê zerzewat û fêkî tînin û herî dawî çûyê Stenbol, Tekîrdağ û Qibrisê. Heman demê de Özviran destnîşan dike ku mîna hin ajokarên Kurd ew jî carinan ji ber barkêşiyê diçe Başûrê Kurdistanê. Özviran, "Ez heta niha çend caran çûme Herêma Başûrê Kurdistanê. Min bi taybet zerzewat û fêkî û amûrên tibî birine."

Barkêşê Kurd Özviran gazinc dike û dibêje ku berê qezenca vî karî baş bûye lê belê niha tevî kedeke zêde an kar nabînin an jî heqê xwe baş nagirin û barkêş nikarin debara malbata xwe bi vî karî bikin. Özviran, " Her ku diçe mesrefên nû ji bo me barkêşan zêde dibe! Ji xwe çawa me wesaîtek kirî û me dest bi barkêşiyê kir, bihayê wesaîtê, muayeneya salane ya wesaîtê û baca wê, bihayê hin belgeyan her heye û barê me giran e! Tevî bêkariya niha, bihayê neftê jî rewşa me zehmettir dike. Her wisa niha em li ser pireya nû a Stenbolê re diçin û tên 300 Lîre wekî din bo çûyîn û hatina otobanê jî 100 Lîre didin. Yanê em tu tiştî qezenc nekin jî ji kisê me zefh pere derdikeve! "

Özviran tîne zimên niha ji ber rewşa sektor û ajokarên kamyon û tiran ew difikire ku dev ji vî karî berde û karekî din bike lê Özviran diyar dike wê kîjan karê bike nizane!

**"Bihayê neftê rewşa me zehmettir dike!"**

Barkêşekî Kurd a bi navê Kemal Hakbilen jî ji Haymanaya Enqereyê ye û bavê xwe hînî vî karî bûye û nêzî bîst salan e ku dişixule. Barkeşê Kurd Hakbilen jî amaje dike ya ku rewşa wan zehmettir dike bihayê neftê ye û wiha diaxive;

"Lîtreya Mazotê 4,5 Lîre ye. Em carinan diçin û tên hema bi tenê heqê mazotê didin. Ji me re tu tişt namîne. Em zirarê dikin û bihayê neftê rewşa me zehmettir dike! Îro ji bo şikevên behrê yên taybet re lîtreya mazotê bi qasî 1 an 1, 5 Lîre tê firotin. Hemû bar û bazirganiya Tirkiyeyê li ser milê barkêşan tê kirin. Çima bo me jî derfeteke wisa çênakin? Ger neft bo me jî erzan be wê rewşa me hinek baştir bibe!"

**"Barkêş bişixulin an jî neşixulîn jî deynê wan her heye û zefh e!"**

Barkêşê Kurd dibêje carinan ajokarên kamyon û tiran ji bo balê bikişînin ser rewşa xwe protestoyan dikin lê belê dengên wan zêde xurt dernakeve an jî nikarin dengê xwe bigihênin dewletê!

Wekî din Hakbilen destnîşan dike ku mehek berê dewletê bo barkêşan dest bi dayîna krediya bêfaîz kiriye. Hakbilen dibêje barkêşên ku ger deynê wan tune be dikarin vê krediya bêfaîz bigirin û wiha didomîne;

"Ez jî çûm bankayê lê ji ber ku deynê min hebû min nikarî vê krediyê bistînim. Divê ev yek bê zanîn ku barkêş bişixulin an jî neşixulîn jî deynê wan her heye û zefh e! Yanê niha ji kîjan barkêşê yanê ajokarê kamyon û tiran bipirsî deynê wan heye. Ez meraq dikim gelo dê kî vê krediyê bikaribe bigire!" Hakbilen ji ber ku nikare kar bibîne difikire ku kamyona xwe bifiroşe.

**"Em gelek caran piştî deh rojan malbatên xwe dibînin"**

Brahim Kandemir jî Kurdekî Haymanaya Enqereyê ye û wek ajokar, nêzî şanzdeh salan e karê barkêşiyê dike. Kandemir diyar dike ku di vê sektorê de hin kes ne xwedî wesaîtan in û wan didin kiriyê. Ew jî mîna hin ajokaran, wesaîtekê kirê dike û wisa dişixule. Kandemir dibêje ji ber ku xwedî kamyon an jî tiran nikarin bi rehetî kar bibînin an jî heqê xwe baş nagirin, kesên mîna wî bi tenê ajokariyê dikin jî an zû bi zû kar nabînin an jî heqê xwe nagirin. Ew jî ji mehaniyên ajokaran gilî û gazin e! Ajokarê Kurd dibêje ew niha bê kar e û wisa diaxive;

"Karê barkêşiyê karekî zehmet e. Em gelek caran bêxew dimînin û diwestin, her wisa em gelek caran piştî deh rojan malbatên xwe dibînin. Heta carinan em nikarin heqê xwe di wextê xwe de bigirin. Piştî mehan ev pere dikeve destê me."

---

## "Dolmeya Mîdyeyê"

# Tama ku ji Ermen û Rûman derbasî Mêrdîniyan bûye



DARAYÊ PORXELEK

'Dolmeya Mîdyeyê', piştî kelandina mîdyeyan nava wê bi birinc tê tijekirin. Ev cûreyeke dolmeyan e. Cara ewil li Stenbolê di sedsala 19. de ji aliyê Ermeniyekî ve, bi berhevkirina mîdyeyan ji sahîlên Stenbolê ceribandina yekem derketiye holê. Îro li Ege û Marmarayê karekî serbixwe ye. Bi destê Ermenî û Rûman dest pê kiriye lê îro ev kar di dest Mêrdîniyan de ye. Mêrdîniyên li Stenbolê bi malbatî bi vî karî re mijûl in.

**"15 sal e Mîdye difiroşim"**

Mazlûmê ku ev 15 sal e li Teqsîmê di sûka Buyuk Parmakê de firotina mîdyeyan dike, dibêje: "Li Tarlabaşiyê ji dayîk bûme, ev 15 sal e li sûkan mîdye difiroşim. Ji ber rewşa aborî piştî dibistana seretayî min terka dibistanê kir. Cara yekem bapîrê min ev kar dikir. Dema hatiye Stenbolê li gel Ermeniyên Tarlabaşiyê dest bi vî karî kiriye. Paşê dibe xwedî meslek. Ji kalê min derbasî bavê min dibe û ji bavê min jî derbasî me bûye. Niha em çar bira ne û mîdyeyan difiroşin. Dayîka min û xwîşka min jî li malê ji bo firotinê mîdyeyan amade dikin. Her sibe zû em radibin diçin mîdyeya dikirin û tînin malê. Diya min û xwişka min li malê mîdyeyan dişon, paqij dikin û birinc dixin navê. Ez jî êvarê tezgaha xwe amade dikim û têm vir."

**"Em bi malbatî vî karî dikin"**

Birayê Mazlûm, Rêzan jî bi qasî 20 mitroyî ji Mazlûm dûr e. Di heman sûkê de mîdyeyan difiroşe. Hê 17 salî ye û ev 5 sal in mîdye difiroşe. Wî jî xwendina xwe di nîvî de hiştiye. Ji ber tunebûnê di pola 9. de dev ji dibistanê berdaye û wiha qala çîroka xwe ya mîdyefiroşiyê dike: "Ji ber tunebûnê min dev ji xwendina xwe berda. Dema min nû dest bi firotina mîdyeyê kir polîsan gelek zehmetî ji min re derxistin. Niha jî gelek zehmetiyan derdixin lê êdî ne polîs, zabita astengî derdixe ji bo me."



**Biroj şêwermendê avahiyan e bişev jî firoşkarê mîdyeyê ye...**

Hoste Mihemedê Mêrdînî yek ji wan kesan e ku dev ji karê bavûkalan bernedaye. Biroj karê şêwirmendiya avahiyan dike bişev jî firoşkarê mîdyeyê ye. Ev 20 sal in li kolanan mîdyeyan difiroşe. Rêvebirina du karan li gel hev, hinek jî girêdayî rewşa aborî ye. Hoste Mihemed çîroka xwe ji bo me wiha vedibêje: "Bavê min 40-50 sal berê ji Mêrdînê diçe Îzmîrê, ji Îzmîrê jî berê xwe dide Stenbolê. Dema tê Stenbolê, dest bi karê firotina mîdyeyê dike. 35-40 salî didomîne vî karî. Niha êdî ji ber kalbûnê nikare bixebite. Em 5 bira ne û em debara xwe bi vî karî dikin. Rojane nêzî 100 Lirayê Tirkiyeyê qezenc dikim. Ji ber zehmetiya debara li Stenbolê, ez du karan bi hev re dikim. Biroj şêwermendiya ewlehiyan dikim bişev jî mîdyeyan difiroşim."

> "Mîdye, mezeyek ji mitbexa Ermenî û Rûman e. Wek tê zanîn Mêrdîn ji aliyê ol û baweriyan ve dewlemend e. Asûriyên Mêrdînê dema hatine Stenbolê ji Ermenî û Rûman hînî vî karî bûne. Dema Mêrdînî tên Stenbolê ji Asûriyan hînî vî karî bûne."

**Mîdyefiroşê xwedî dîplomaya zaningehê**

Emrah Akin, li Zaningeha Akdenîzê ji beşa Xebatkariya Ofîsê û Mihasebeyê dîploma wergirtiye. Piştî zaningehê kiriye nekiriye karekî li gor beşa xwe nedîtiye. Li gel kekê xwe dest bi firotina mîdyeyê kiriye. Emrah, ji karê mîdyeyê hez kiriye û ev 5 sal in jî karê xwe didomîne. Ji bo me çîroka xwe wisa tîne zimên: "Min zaningeh xwend. Zaningeh bi dawî bû lê wek hûn jî dizanin li Tirkiyeyê xwendina zaningehê nayê wê wateyê ku mirov dibe xwedî kar. Ez jî ji mecbûrî di karên cûda de xebitîm. Herî dawî jî li cem birayê xwe min dest bi firotina Mîdyeyeyan kir. Ji karê xwe memnûn im. Eger zabita êrîşî me nekin tu pirsgirêkên me nîn in."

**Firoşkarê mîdyeyê yê Agirî**

Her çiqas hejmara wan kêm be jî ji bilî Mêrdîniyan jî Kurd li Stenbolê vî karî dikin. Yek ji wan jî Feyazê Agirî ye. Ji bajarê Agiriya Bakurê Kurdistanê koç kiriye Stenbolê. Li Stenbolê firoşkariya mîdyeyê dike. Çîroka xwe ji me re wiha vedibêje: "Bavê min beriya 30 salan ji welêt tê Stenbolê. Di dest de hostetî tune bûye. Li gel Mêrdîniyan dest bi çêkirin û firotina mîdyeyê dike. Piştî demeke dirêj ji xwe re tezgahekê peyda dike û li kolana Mîs a Teqsîmê dest bi firotina mîdyeyan dike. Niha ew derbasî Cîhangîra Beyoğluyê bûye. Kekê min ket cîhê bavê min û ez jî ev 10 sal in li Teqsîmê me. Em bî malbatî vî karî dikin. Her firoşkarek xwediyê mekanê xwe ye. Ji bilî wî tu kes naçe cîhê wî firotinê nake. Ev yek di çanda me de jî tune jixwe. Em ji hev re û ji nanê hev re rêzdar in.

### Ji ber çi mîdyefiroş bi giştî Mêrdînî ne?

Hoste Mihemedê Mêrdînî pirsa me wiha dibersivîne: "Mîdye, mezeyek ji mitbexa Ermenî û Rûman e. Wek tê zanîn Mêrdîn ji aliyê ol û baweriyan ve dewlemend e. Asûriyên Mêrdînê dema hatine Stenbolê ji Ermenî û Rûman hînî vî karî bûne. Dema Mêrdînî tên Stenbolê ji Asûriyan hînî vî karî dibin. Wek hûn jî dizanin li Mêrdînê Asûrî, Ermenî û Misilman bi hev re dijîn. Mêrdîniyên tên Stenbolê li gel biraderên xwe yên Ermenî dest bi xebata firotina mîdyeyê dikin. Nas û pismamên wan jî dema tên Stenbolê li gel wan dest bi hînbûna amadekirina mîdyeyê dikin. Piştî hîn dibin ji xwe re tezgahek û mekanek dibînin da ku mîdyeyên xwe bifiroşin. Ji ber vî tiştî firoşkarên mîdyeyê bi piranî Mêrdînî ne."



# Dinga Lezzetan yê Tarîxî: Muze Bîstro Cafe





Kafeyî, cuya bajaran de mekanê trendî yê û kulturê kafeyan êdî welatê ma de zî cayê xo girewto. Ma vînenê ke sey pêro bajaranê girdan Dîyarbekir de zî roj bi roje kafeyê baş û kalîteyinî abenê. Goreyê zewqê merdiman zaftewirîya konseptê înan bale anceno. Hela tayê kafeyî estê ke atmosferê înan raşta zî cîya yo; bi sayeyê mekan yan zî dekorasyonanê xo û stîlane xoyê retroyan harmonîya tarîx, hîsan û ewroyî awan kenê. Eke ser o zî manzaraya înan a weşe estba îhtîmal o ke merdim ge-ge tede ca nêvîno ke ronişo. Ma şima rê Dîyabekirî ra mekanêkê winasî danê şinasnayîş; Muze Bîstro Cafe.


Bînayêka tarîxî ya ke mîyanê Seraya Dîyarbekirî (İçkale) de ca gêna, ewro bi no name sey kafe êna xebitnayene. Muze Bîstro Cafe, hîrê serrî verê cû abîya. Na bîna eslê ci de milkê wezaretê kulturî yo û vera ortaxîya karî tehsîsê nê xizmetî bîya yan zî mavajîme ameya kîrakerdiş. Kapasîteya xo, tebê di qatê bîna û hewşa aye, goreyê 500 mêmanan a. Kafe, her roje mabênê 07:00 û 23:00 de akerde ya û tede vîst personelî xebitîyenê.

Baş o, merdim na kafe de eşkeno çi bişimo û biwero? Bi yew cumle; şima eşkenê lezzetanê mehellîyan û yê mitbaxanê cîhanî ra zaf nimûneyan biwerê û bişimê. Ma çendê înan wina rêz bikerê; arayî, selata, snackê şefî, patîra, aparatîfê germinî, çeşîdê meqerneyî, werdê goştinî (kerge û goşto sûr), steakî, maseyî, fajîta, pîzzayî û helbet çay, meşrubat, heme çeşîdê qeweyan, barê vîtamînan, frapper. mîlkshake, smoothies. Teberê nînan de ganî ma qeşaşit û şîranîyan xo vîr ra nêkerîme. (Semedo ke eynî wareyî de û nêzdîye aye de camî û kîlîse estê tede şimitayê alkolinî nêroşîyenê)

Muze Bîstro Cafe de muzîko ganî nêno îcra kerdene la yeno vatiş ke hetanî yew aşme do dest pêbiko. La reyna zî beno ke xaftela vengê yew gîtare, saz, bilure yan zî klarnetî bêro goşanê şima. Çunke muşterîyê kafe eşkenê enstrumananê xoyê ke xo het de ardê bicinê. Çîyo tewr weş zî manzaraya hewşa kafe ya. Şima eşkenê vera manzaraya panoramîke ya Baxçeyanê Hewselî de çay yan qeweyê xo bişimê. Cayo ke merdim tede xizmeto fekhuyayîşin, manzara û tarîx pîya bivîno, helbet keyfweş beno. Ma bi xo vanê xo na keyfweşîye ra mehrum meverdê.

***Müze Bistro Cafe***
***Cevat Paşa Mah. Hz. Süleyman Sk. No: 43***
***Tel: 0 412 224 40 01***

# Huner û Psîkolojî




**MURAD BURTAKUÇÎN**

Eke mewzûyê ma huner û psîkolojî bo ganî tewr verî ma merdiman ser o etud bikerî. Destpêk de cayê merdimahî baş îzah nêbo, na mesela nêna zelal kerdene. Çunke tarîxê ortevejîyayîşê huner reseno heta tarîxê ortevecîyayîşê merdimahî. Sewbîna ganîyan ra cîyabîyayîşê merdiman girîngîya taybetmendîya hunerî ya. Xora tarîxê psîkolojî, tarîxê merdimahî ra hîna kehenêr o. Verê merdimahî heywanan estbîy û zanist kerdo eşkera ke psîkolojîyê heywanan zî esto. Labelê ortevejîyayîşê zanist zî pê destê merdiman bîyo. Coka herçiqas tarîxê psîkolojî tarîxê merdimahî ra kehenêr bo zî merdim pê hîş û cigêrayîşê xo bîyo wayirê nê heqîqetî.

Hîre hezar (3.000) serrî yo ke merdimî kenê ke pênasê hunerî hîna raşt bikê. Huner semedê çîyî esto? Maneya hunerî çî yo? Huner çi karî rê beno? Kamî ra hunermend/e vajîyeno? Merdiman çira îhtîyac dîyo û fealîyetê hunerî viraştê? Fîlozofanê Antîk Yunanî ra nata merdimî cewabê nê persan gêrênî. Hetanî nika zî merdiman çi manaya hunerî ser o îttîfaq nêkerdo û nêameyê têhet. Ez verê hunermendan û fîlozofan ra ozur wazena û dima gorêyê xo fikrê xo hunerî îzah bikerî. Her merdim hîs û fikrê xo bi yew qayde ramojneno. Eke hîs û fikrî zerrî ra û yew aheng û estetîk mîyan de bivejî teber ma ney ra vanî huner. Heskerdiş, dej, bêkesîyê, cîyayîye, eşq, tenabiyayîş cuya/dinyaya heme merdiman de estî la heme merdiman ra eynî qayde nêdîyenê teber. Eke hunermend/e, hîsan û komelî ra dûrî bikewo ehlaq, estetîk û hunerî ra zî dûrî keweno/a. O eserê hunerî yo ke dûrê fikrê komelkî de bêro viraştiş sey balone hewa de maneno. Yew vayo şenik zî eşkeno na balone pif bikero û bero vîndî bikero.

Hunerî ser o psîkologan, psîkîyatrîstan û ê kesanê ke psîkolojî reyde eleqedar bîyê û cigêrayîşî kerdê, înan zî tayê çîyî vatê. Zaf kesan cîya-cîya fikrî eştê ortê la ez bi xo înan ra di fikranê balkêşan ser o vinderî. S. Freud, viraştoxîya hunerî sey nêweşîye vîneno û hunermendan ra vano; “merdimê nêweşî”. Freud seba psîkolojî yew merdim ki muhîmo. Na mesele de zî teorîya Freudî zaf ameyo rexnekerdiş. Labelê teorîya ey de zaf cayê ke mumkun o merdim ser o munaqeşe bikero estê. Xora no xusus zî bîyo wesîleyê vejîyayîşê cîya-cîya fikran. Freud, romannuştox Dostoyewskî û muzîsyen Beethoven û eserê înan ser o cigêrayîşî kerdê. Goreyê Freudî hîsê hunermendan bediliyenê û hîna zaf ferqî vejîyenî ortê. Mesela; Dostoyewskî seba ke rikê bi babîyê kerdo û mergê ey waşto, xo sucdar vîneno. No semed ra “Birayê Karamazov” nuseno. Sigmund Freud vano; Dostoyeskî nêeşkeno nê hîsanê xo mîyanê cuye de îfade bikero yan zî eke eşkera bikerdêne zî o wext xo ca de sucdar vînayêne. Aye ra hîsê xo bedilnayo û ê romanî ser ro ramojnayê.

Heto bîn ra fikrêko balkeş û weş zî Rollo Mayî ra eşnawîyeno. R. May; weverê S. Freudî de vindeno. O vano ke viraştişê hunerî nêweşîye ra peyda nêbeno. Gama ke merdimî tena bimanê, netîceya nê tenabiyayîşê înan de enerjî ki vejîneno orte, na enerjî huner o. Goreyê R. Mayî na enerjî herkes de çîn a. Tena hunermendan de esta. Aye ra na enerjî zaf qiymetin a. Seserranê verênan de komelan zaf biaqilan/dehayan û gejan eynî eynî kategorî de dîyo. Labelê nika no feraset raşt nêno vînayene. Nêweşîya hîşî ya hunermandan û xîntan/gejan , miyanê komelî de sey yewbînan nênê dîyayene. Ê ke hîşê înan problemi estê, nêweş ê, xînt/gej ê yan nêweşxaneyan de tedawî vînenî yan zî komelî ra îzolê benî. La hunermendan û komelî mîyan de yew pewendî (bağ) esto. Hunermendî, zanayîşê xo,derheqê komelî de vînayişê xo, komelî rê eşkera kenê. Ê, eşkerakerdişanê xo bi wasitayê hunerê xo kenê.

Her kes yew eserê hunerî ra eynî çîyan fehm nekeno. Na zî ma rê ramojneno ke psîkolojî û fehmkerdişê merdiman cîya-cîya yo. Demo ke yew muzîsyen eserê xo virazeno komel de çi dej anto yan zî çira şa bîyo û nê hîsî dinyaya hunermendî de yenî çi mana, înan neqlê notayanê xo keno. La hancî zî ê eserî ra pêro goşdarîkerdoxî eynî çîyan fehm nêkenê. Ehmedê Xanî Mem û Zînê xo de eşqê di merdiman nuşto yan zî eşqê welatî nuşto. La beno ke her kes ci ra eynî mana nêvejo. La Ehmedê Xanî wexto ke Mem û Zînî nuştêne, nêvato beno ke nê çekuyanê mi ra tay kesî fehm nêkerî aye ra ez înan ney nînan binusî. Ehmedê Xanî hîsê xoyê xorînî senî ke vejîye meydan o hawa nuşto. Kam senî fikirîyeno wa bifikirîyo! Hetanî ke îhtîyacê merdiman bi huner bibo huner zî devam keno. La winî aseno ki huner, hunermend û munaqeşeyê ke viraştişê eseranê hunerîyan ser o benê do hetanî ke merdimî estbê dewam bikerê.



**ÎSMAÎL GUVEN**

## Gedeyî û Dadî-Babî (3)

Mîyanê ma Kurdan de hetanê neslê ma, hol-xirab nîzamêk estbi. Veyve ameyêne keyeyî ser, binê destê vistewrî de bîyêne pîl, gedeyo ke ameyêne dinya qasê dadîya xo verê dapîra xo de bîyêne pîl. Dadîyan de persê sey “Ez do senî biewna gedeyê xo, gedeyê xo senî pîl bika, gedeyê mi qey wina keno ûsn...” wina zaf çin bî, xora eke bibîn zî destê înan ra zaf çî nêameyêne ke bikerî. Gede mîyanê gedeyan de, destê vistewrî û goriman de bîyêne pîl. Labelê rojêk ame, Kurdanê ma bar kerd bajar. Dest de teway çin o, coka banê qijkekî viraştî. Axîr binê yew banê qijkekî de pîya ciwîyayîş bi zehmetin. Û hêdî-hêdî “nuclear family” vejîyayê meydan. Û nê keyeyê ke dadî, babî û gedeyan ra yenê pê, problemê neweyî xo reyde ardî. Dadî-babî bîyê wayîrê gedeyan; labelê nêzana se bikerî, senî miqate bibê. Û ê persê corênî kewtê zîhnê înan. Ma beşanê verênan de gede û dadî-babî nas kerdbî, ez do na beşa peyêne de çend çîyanê pratîkan binusa ke wa dadî-babî têkilîya bi gedeyan de xo vîr de bitepişî.

Gedeyan de Zêdînayîşê Kerdena Başe

Pesn û teqdîr de sînorî mevêrîn: Gedeyî pesn û teqdîr ra zaf hes kenê. Pesênayîş seba înan zaf muhîm o. Labelê her kerdena başe ra dima pesênayîş, teqdîr kerdiş yan zî xelatdayîş her çend ma rê weş bîyerê zî mudeyêk ra dima tesîrê xo kenê vînde. Gede êdî tena seba girewtişê xelate yan zî pesnî hereket keno. Kerdene ra zaf peyina kerdene bena muhîm. Û wexto xelate û pesndayîş kêmî bo kerdena başe zî kêmîyena.

Potansîyelê gedeyê xo kifş bikerîn: Heme dadîbabî wazenî wa gedeyê xo bi hewayêko serkewte cuya komelkî de cayê xo bigêro. Gede senî ke beno seba ey planan virazenî, kewenê mîyanê xeyalan. Lajê mi wa doxtor bo, kênaya mi wa hemşîra ba... Nê fikran ra dûrî vindîn, bala xo bidîn gedeyê xo ser; biewnîn hele gedeyê şima çi ra hes keno, eleqeyê xo bi çi esto. Merdimî wexto yew karî ra hes bikerî hîna serkewte benî, hîna zerrî ra kenî.

Bawerîye bidîn gedeyê xo: Seba ma ganîyan hîsê bawerî qasê hîsê heskerdişî muhîm o. Merdimî wexto yewî ra bawer bikerî, fikir û herekanê ey ra zî bawer kenî. Coka eke gedeyê şima, şima ra bawer bikero problemê mabênê şima hîna rehet çareser benî, mîyanê şima û gedeyî de têkilîyêka başe nîyena ro. Gede seba pawitişê na bawerîye, xo çîyanê şaş û xiraban ra dûrî geno.

Gedeyê xo de hemkarîye bikîn: Eke şima derheqê gedeyê xo de qerarêk genî, fikrê gedeyê xo zî bigêrîn. “Ma qerar girewt, ti tabîî be” nêbeno; gede milê xo rono zî zerrîya xo ra îtîraz keno. Nê îtîrazî vera-vera gedeyî kenî hêrsokin. La heto bîn ra eke şima fikrê gedeyê xo bigêrî gede xo hîna muhîm, biqîmet hîs keno.

Gedeyan de Kêmînayîşê Kerdena Xirabe

Şima gedeyî ra çi wazenî, îzeh bikîn: Eke şima nêwazenî wa kerdenê xirabî yê gedeyî dibare bibî, ganî şima ney îzeh bike. Kerdena başe qey baş a, ya xirabe qey xirab a; ganî şima gedeyî ra vaje. Ez nêwazena, ez hêrs bena ûsn... Cuya xo ra nê qaliban bierzîn. Ganî gede bizano ke ti qey hêrs benî, ti qey nêwazenî. Eke gede sebeban bimuso, êdî bi xo kerdena xo vurnena. Seke mi cor de zî îzeh kerd, beno ke gede peynî de sey şima bikero; labelê wa mecburî ra ney, wa zerrî ra bikero.

Gede qey wina keno, fehm bikerîn: Eke gedeyê şima kerdenêka xirabe bikero, midaxaleyî ra xo ra bipersîn: No gedeyê mi qey wina têgêreno? Gedeyî de empatî bikerîn. Belkî zî seba ke dîqetê şima bianco yanî seba ke şima tira hes bikerî wina keno. Probleman de fehmkerdiş nîmeyê çareserkerdişî yo. Gelo çîyo ke ma sebebê xo fehm nêkerdo ma do senî çareser bikere?

Bi kerdena xo gedeyî rê model bîn: Şima gedeyê xo ra çi vanî vajîn, çi îzehet danî bidîn; eke kerdenê şima û vateyê şima pênêkewî tu qîmetê vateyê şima nêmaneno. Ser de, bawerîya gedeyî bi şima nêmanena. Çimkî gedeyî bi teqlîdkerdişî musenî. Beno ke vateyê şima bikerî, labelê kerdenê şima ey nêwazî zî derbazê înan benî.

Dormaleyî bivurnîn: Rey-rey dormaleyo ke gede tede beno pîl, beno sebeb ke gede kerdena xirabe nîşan bido yan zî kerdena xirabe ke esta bizêdno. Nê rewşan de vurnayîşê dormaleyî zî alternatîfan ra yew o.

Dîqetê gedeyî bidîn yewna het a: Beno ke gedeyî çîyêko xirab kerd, a deqa dîqetê xo medîn kerdena xirabe ser. Seke qet nêbîya. La senî ke kerdenêka başe kerd, xelate bidîn gedeyî. Bi no hewa vera-vera kerdenê xirabî kêmîyenî û yê başî zêdîyenî.

Heqê vîjnayîşî bidîn gedeyî: Yanî gedeyî bixapînîn. Mavaje gede dersa xo nêvirazeno, di alternatîfan bierzîn vernî: Ti dersa xo nika nusenî yan des deqayan ra dima? Gede her çend kontrolî xo de bizano zî, kontrol destê ma de yo. Gede çi vîjneno wa bivîjno, peynî de waştişê ma yeno ca.

Kamîya Bawerîyêka Qedîme:

# Êzidîtîye (1)



SELMA DOGU

MILETÊ kurdî ke miletanê eslîyan yê rojhelatê mîyanên ra yew o, bi zaftewirîya cografya, folklor, lehçe, dîn û bawerîyanê xo bale anceno. Çend bawerîyê orîîjînî yê kurdan ê ke tarîx nata bîyê mewzûyê zaf cigêrayîşan, înan ra yew zî êzidîyê ya yan zî sey grûba kurdan a dînîye kurdê ezidî yê. Balkeş o ke mîyanê rîpelanê tarîxî yê dejinî de êzidîyan hertim cayê xo girewto. Çi heyf ke qederê kurdan tewr giran êzidîyan ser ra tecelî kerdo û hema zî wina dewam keno. Êz vana qey dinya ser o yew netewe çin a ke qasê êzidîyan heqeret û zulmî dîyê. Êzidîyî sehneyê tarîxî de zaf rey maruzê jenosîdî mendê. Sebebê na dişmentîye pêro bawerîya înan bîyo. Çunke êzidîyî timûtim bi secdekerdişê şeytanî ameye sucdar kerdene. Bawerîya êzidîyan teberî ra zaf balkeş ameyo dîyene û no semed ra maruzê tewir bi tewir sifet û nameyan mendê.

Ez nê nuşteyê xo de wazena ke bi hawayo objektîf û çarçewayêka umumî de êzidîyan bida şinasnayene. Semedo ke cayê ma teng o ez nêeşkena bikewa zaf teferuatan mî yan. Labelê çiqas mumkun bo ez do xetanê esasîyan yê na bawerîye ser o vindera. Ma babeta xo binê çend sernuşteyanê cêrênan de pêşkêş bikê...

**A)Tarîx û Etîmolojîyê Înan**

Êzidîyî ke tarîx ra nata bi hawayo xoîzolekerde ciwîyayê, dînê xo bi wasitayê kulturê fekkî û bi şeklêko nimite az bi azê neql kerdo. Tebîî yo ke nimitîyayîşê pêserîya dîn û kulturî bîyo, sedemê tayê nakokîyan û na rewşe ver mumkun nêbîyo ke merdim derheqê înan de wayîrê doneyanê muteberan bibo. No semed ra cigêrayoxan derheqê kok û nameyê êzidîyan de fikrêk ser o pênekerdo û naye ra perpektîfê cîyacîyayî vejîyayê vetê.

Goreyê îdîaya tayê tarîxnasanê îslamî, kokê êzidîyan mezhebê xarîcîyan ra reseno Yezîd b. Uneysî û coka înan ra êzidî vajîyeno.. Labelê no îddîa rast nîyo. Çunke êzidîyî ke girêdayeyê beşê xarîcîyan ê û êzidîyî ke badê Şêx Adî b. Mûsafîrî vejîyayê meydan,

înan mîyan de tu fikrêko ortax çin o. Tena hetê nameyî ra eynî hesibîyenê. Goreyê şîroveyê umûmî êzidîtî sey zerdeştî, sabîtî, manîheîzm û mîtraîzmî dewamê dînanê Îranî yê qedîman a yan zî şeklêkê bedilnaye yê nê dînan o. Tayê êzidîyan îdîa kerdo ke kokê înan sumerîyan ra ameyo. Her di hetî zî kokê xo benê resnenê Hz Ademî. Welhasil ma nê mîtê estbîyayîşî yê êzidîyan kitabê înan yê qedîmî Mishefa Reşî ra zî wanenê.

Herçiqas nê îdîayî ameyê kerdene zî ma nêeşkenê dewrê Şêx Adî b. Mûsafîrî ra ver estena êzidîtî ra behs bikê. Goreyê çimeyanê etud bîyayeyan ma ne dewrê Şêx Adî b. Mûsafîrî de ne zî ey ra ver nêeşkenê estena êzîditîya ewroyine ra qal bike.

Çend tebeqayê ke seserra V. ya hîcrî de, wextê Şêx Adî b.Mûsafîrî de na mintiqa de ciwîyayê sey êzidîyan ameye namekerdiş zî, zehmet o kê merdîm vajo nê tebeqayî manenê şeklê êzidîyanê ewroyinan.

**A)Awanbîyayîşê Dogmaya Êzidîyan**

Tewr verî Ahmet Teymûrî, îspat kerdo ke azê êzidîyan bîzatîhî terîqetê Adewîye ra yeno.. Goreyê M. Guîdî; tesîrê waazanê Şex Adî, no hereket ver bi meylê mîstîsîzmî şîyo. Şex Adîyî ke mintiqaya Cebel Hekarî ya Laleşî de maneno terîqetêko qelebalix ronayo. Nê terîqetî, verê cû averşîyayîşêko muhîm qeyd kerdo la demek ra pey bîyo di grûbe cîya-cîyayî. Grûba ke şîya hetê Surîye û Misir, uca ca bîya, zemanêkê kilmî ra dima mîyanê komelî de asîmîle bîya. Grûba bîn a ke Kurdîstan de menda vera-vera sunîtîye xo vîr ra kerda. Na grûbe bingeyê êzidîtî ronaya.

Naye ra ma şênê vajê ke awanbîyayîşê terîqetê Adewîye xetêka sunî ser o dest pêkerdo la mîyanê prosesî de şeklê êzidîyanê ewroyînî girewta.

**B)Cografya û Nufusê Êzidîyan**

Şerefxan Bidlîsî, Şerefname de cayê ke êzidîyî tede ciwîyenê ra wina behs keno; Êzidîyî, hetanî Musûl, Silêmanîye, Haleb, Kilîs, Meraş, Wan, Cizîre, Amed, Mêrdînî mintiqayêka hîra ra vila bîyê. Naye ra zî fehm beno ke êzidîyî cografyaya Kurdîstanî de ciwîyayê. Ewro zî Kurdîstanê Başûrî, Tirkîya, Surîye, Armenîstan, dewletanê Ewropa û Rusya de ciwîyenê.

Goreyê çimeyanê êzidîyan ewro dinya de nêzdîyê 600 hezar êzidîyî estê û no zî % 2inî yê nufusê kurdan keno. Nufusê êzidîyan tewr zedê mintiqayanê Duhok, Şêxan û Şingalî de esto.

**C)Şêx Adî Bîn Mûsafîr**

Neslê Şêx Adî bîn Mûsafîrî, xelîfeyê peyînî yê Benî Umeyye Merwanî ra reseno Merwan bîn Hakem el-Emewîyî. Heme çimeyî nê xususî tesdîq kenê ke, o erebêko Emewî yo. Şêx Adî, serra 1072î de nahîyeya Baalbekî ya Şamî de maya xo ra bîyo. Pîyê ey Şêx Mûsafîr merdimêko zaxît o. Cayokê tede maya xo ra bîyo uca domanîya xo vîyarnayo û perwerdeyê xo verên zî reyna uca temam kerdo. Badê cû seba ke perwerdeyo berz biko Şamî ra şîyo Bexdad. Perwerdeyê zanistanê fikih, kelam û hedîsî dîyo. Rîwayet beno ke hetê alimê namdar yê nê dewrî Ebdulqadir Geylanî ra ameyo wesifnayîş û sey zatêko pîl hesibîyayo.

Şêx Adî badê perwerdeyê xo, seba ke cuya xo tena bivîyarno (înzîva) Bexdatî ra şîno koyanê Hekarî. Dima ra şino Laleş û uca de zawîyeyêka pîle awan keno. Şêx Adî, emrê xo yê 90 serreyîye de qet nêzewecîyeno. Heta peynîya emrê xo Laleş de ciwîyeno û wexto ke mireno zereyê zawîyeya xo de defin beno.

Seke yeno zanayenê hem Şêx Adî hem terîqetê ey Adewîyîye verê cû xeta ehlê sunetî de ca girewtêne. Xelefê ke mergê Şêx Adîyî dim ameye herinda ey, înan zî xeta ehlê sunetî de ca girewto. Reya peyêne Şêx Hesen beno xelefeyê terîqetî. Dewrê Şêx Hesenî de terîqet vurîyayîşêko struktural derbaz keno û herinda sufîtîya îzolekerdeyî de awanîyêka dînamîke esas gêno. Goreyê şeklo ke çimeyan ra neql beno, atabeganê tirkan ra Walîyê Musilî Bedrettîn Luluyî, Şêx Hesen qelaya Musilî de dardê kerdo.

Ê wextan zafê adewîyî ke Laleşî de ciwîyayêne yan hetê kolonyalîstan ra kişîyayê yan zî ameyê esîr girewtene. Tayê înan zî seba ke ganê xo bixelesnê remayê. Pîrozgehê Laleşî ameyo xirabe kerdene. Mensubanê terîqetî ke xeta adewîyîye esas girewto, ê eşkayê xovardayîşê xo hetanî seserra XVI. bidomnê. La prosesêkê dergi ra dima mîyan ra wedarîyayê û vîndî bîyê şîyê.



Miletê kurdî ke miletanê eslîyan yê rojhelatê mîyanên ra yew o, bi zaftewirîya cografya, folklor, lehçe, dîn û bawerîyanê xo bale anceno. Çend bawerîyê orîîjînî yê kurdan ê ke tarîx nata bîyê mewzûyê zaf cigêrayîşan, înan ra yew zî êzidîyê ya yan zî sey grûba kurdan a dînîye kurdê ezidî yê.

**D)Esasê Bingeyinî yê Bawerîya Êzidîtî**

**a)Rêxistinbîyayîşê Dînî**

Mergê ronayoxê bawerîya êziditîye ra pey, murîdê terîqetî zaf bîyê zêde. Nê zêdebîyayîşî ra giredayê tayê qaydeyê ke mecburîyetê têkilîya murîdan û ustadî kerdê pêt ronîyayê. Bi no hawa hîyerarşîyê sertî yê terîqetî cayê girewto. Mabenê prosesî de mîyanê êzidîyan de sey şêx, pîr, feqîr û qewal tebaqayî vejîyayê meydan. Kam tebaqa ra beno wa bibo her êzidî/ye yew homa, yew şêx, yew pîr û yew birayê axîretî xo rê sey wekîl qebul keno/a. Çîyo ke awanîya êzîdîyanê ewroyinan kerdo sexlam na taybetîya bawerî ya. Pêro êzidîyî roja ke maya xo ra bîyê nêbîyê a roje ra tepîya mensubê kamcîn tebaqa yê, mîyanê aye de benê pîl, zewecîyenê û mirenê. Tebaqaya înan a sinife çi rey nêbedilîyena.

**1)Mîr**

Komelê êzidîyan de meqamo tewr pîl mîrîtî yo. Mîr, temsîlkarê êzidîyan o. Keyeyê mîrî, turbeya Şêx Adî ra dima cayo pîroz o dîyin yeno hesibnayenê. No meqam bi sistemê verasetî domîyeno. Mîr, eşkeno bi emr û waştişê xo yew êzidî/ye dînî ra bivejo. Mîr hetê etnîkî ra ereb o. Yê roja ma zî daxîl mîrî zafanê derûdore Bexdat û Mûsilî de ciwayeyê.

**2)Şêxî**

Cematê êzidîyan de mîrî ra dima tebeqaya tewr corine de şêxî estê û seba ke ê kokê Şêx Adî ra yenê ereb ê. Êzidîyî, keyeyanê şêxan pîroz qebul kenê. Cilanê sipîyan xo ra danê û şaşikêka sîyaye girê danê. Murîde ke binê emrê şêxan de yê, şexê xo sey lîderê xo yê dînî vînenê. Murîdî bacî danê şêxê xo. Roşanan û veyveyan de, merasîmanê sey merg, waftîz û sunetkerdişî û tedawîya neweşîyan de çend berpirsîyarî ke ganî bêrê ca hetê şêxan ra yenê kerdene. Komelê êzidîyan de tena heqê şêxan esto ke biwanê.

**3)Pîrî**

Pîrî çend keyeyan ra îbaret ê û sey şêxan kokê pîran zî rêseno mintiqaya Şêxan. Wezîfeyê pîran û yê şêxan hema-hema eynî yê. Cîyabîyayîşê name û meqamê înan tena hetê etnîkî ra yo. Şêxî, kokê Şêx Adîyî ra yenê û no sebeb ra ereb ê labelê pîrî murîdê Şêx Adîyî ke kurd ê, kokê înan ra yenê. No semed ra kurd ê. Pîrî, cilanê sîyayan danê xo ra û şaşikêka bi muyanê sîya û sûran ameya munitiş, aye sereyê xo ra pişenê. Ê, hetkarîya şêxan kenê û miqateyê turbeyan benê. Wezîfeyanê înan ra yew zî wextê hecî de temînkerdişê çîyanê werdiş û şimitişan o.

**4)Qewalî**

Qewalî (hafizî) tena dewê Beşîka û Bexzane ke girêdayeyê mintiqaya Şêxanî yê de ciwîyenê. Qewalî, heykelê teyrê tawûsî ke melekê Tawûsî temsîl keno genê xo het û bi no hawa her serre reyêk cemaatê êzidîyan ra gêrenê. Bi nê zîyaretan amancê înan no yo ke bawerîya êzidîtî timûtim ganî bimano. Merdim şêno vajo ke no tradîsyonê înan maneno fealîyetê mîsyonerîye.

**5)Feqîrî**

Wezîfeyêko dînî yê feqîran çin o. Hîna zaf bi cilanê xo namdar ê. Feqîrî, sey adetê Şêx Adîyî, cubeya ke kobeyê ci bi rengê sûrî virazîyaya danê xo ra, şaşikêka sîya şanenê sereyê xo ra û mîya ke bi rengê sûr û sipîyî ameya munitiş mîyaneyê xo ra gire danê. Naye ra teber çend wecîbeyê înane dînî nê yê; serrêk de 92 rojî roje girewtene, cilanê huşkan ser o rakewtene, cixara û alkolî ra dûrî mendene. Sewbîna zî feqîrî çi rey tiraş nêbenê. Çeke şuxulnayene û gonî rişnayene qedexe yo. Feqîrî debara xo bi sedeqeyan kenê. Mîyanê komelî de mîsyonê înan mabêncitîya aştîyane ya.

**6)Tebaqayê Bînî**

Tebaqayê ke ma nameyê înan cor ra nuştî, înan ra teber çend hebê bînî estê ke mîyanê êzidîyan de zaf namdar nîyê. Înan ra yew zî koçek ê. Manaya koçekî "goşê qulkerde" yo. Koçekî dinya ra destê xo ancenê û turbeya Şêx Adîyî de hetanî mergî emre xo bi îbadet vîyarnenê. Yewna tebaqaya ke ma tîya wazenê qalê ci bikê micêwîr ê. Ewro hûmara înan zaf tay a. Ê zî pîran miqateyê turbeyan benê û şewa dişeme ra heta serê sibaya çarşemeyî turbeyan de lambayan tafînenê.

**b)Bawerî û Îbadetî**

**Homa û Melekeyî**

Bawerîya êzidîyan de homa pawitoxê dinya nîyo tena xeliqnoxê dinya yo. Sîstemê bawerîye homayo tekane esas gêno. Goreyê na bawerîye homayî heme feza xeliqnaya û o bi zeman û mekan sînorkerde nîyo. Homa wayirê statuyêkê fealî nîyo û dinya reyde eleqedar nêbeno. Labelê sey Meleke Tawusî pexambere ke înan rê rayîr nîşan bidê û sewqê rindîye bikêerşawite. Kitabê înanê pîrozî Kitabê Cîlwe û Mishefa Reşî de çend pexamberî ke nameyê înan vîyarenê nê yê; Adem, Nuh, Yunus û Îsa yê. Êzidîyîye de bawerîya melekan cayêko muhîm teşkîl keno. Hûmara melekan hewt heb ê. Meleke Tawus û Sultan Êzî teber ê bînî zaf domînant nîyê.

*(dewamê nuşteyî esto)*

# Gencîneyên Kurdî: Nivîs



NURULLAH ALKAÇ

**HEMÛ** gencîneyên Kurdî hê derneketine ser rûyê jiyana nivîskî. Bi hezaran berhemên ku nayên zanîn yên şexsî û yên saziyan ku him di serdema me de û him jî yên serdemên berê ku hê nehatine çapkirin hene. Di serî de Evliya Çelebî, rêya kîjan seyyahî ketibe Kurdistanê di pirtûka xwe de aniye ziman ku her mîrekî Kurdistanê xwediyê pirtûkxaneya xwe ya taybet e û di van pirtûkxaneyan de jî pirtûkên Kurdî hene. Mixabin îro van berhemên ku bi tîpên Erebî ne, piraniya wan nayên dîtin. Gelek sedemên vê yekê hene.

Di nav van sedeman de tiştê herî girîng ev e; 'Erdnîgariya Nîgaşkirî' zimanê Kurdî li her deverekê bi awayekî cuda li Tirkiyê, Suriyê, Îran û Îraq hatiye astengkirin. Qedexekirina ziman, him pêşketina Kurdî him jî gihandina van berheman asteng kiriye. Nebûna pîsporan, kêmqedirdayîna çand û zimanê Kurdî, erdnîgariya ji hev dûr, bêîmkaniya dewletê (Patronaj) û sedemên din in. Yek ji mînakên ku li Tirkiyeyê berhemên Kurdî hatine şewitandin jî Medreseya Aktepeyê ye. Medrese di sala 1939-1940'î de ji aliyê leşkerên Tirkiyeyê ve hate şewitand û hemû berhemên Kurdî jî pê re şewitîn. Her wiha ev êrîş di sala 1961, 1971 û 1980'î de jî hat dubarekirin.

Di sedsala 19. û 20. de ji aliyê çend Kurdologan ve berhemên Kurdî li Pirtûkxaneyên Rusya û Ewropa hatin berhevkirin. Ev yek jî astengî û qedexekirina li ser Kurdî bi kêmanî be jî kêm kiriye. Îro di dest te çend berhemên Kurdî hebin jî bi saya van Kurdologan e.

**Rusya:**

A.Jaba, berhem û berhevkirinên edebî yên Mela Mahmûdê Bazidî di sala 1850'î de biriye Navenda Zanistî a Rusyayê. M.B Rudenko di derheqê Jaba, W. Velyaminos Zernov, B.A Dorn û nivîsên çend kesên sereke di sala 1961'an de wek bîbliyografî çap kiriye.

**Îraq:**

Di serî de 'Pirtûkxaneya Berhemên Nivîskî a Silêmanî' li Pirtûkxaneya Bexda, Kerkûk, Mûsil gelek berhemên bi zaraveyên Kurdî hene. Her wiha Pirtûka Mihemed Elî Karadaxî heta niha 10 cîlt hatiye çapkirin ku bi navê "Bu Wejandenevi Mijuyi Zanayani Kurd le Rigeyi Desthete Kayna Newe" di derheqê berhemên Kurdî ku li Îraq, Herêma Kurdistanê û Mûsilê ne de agahiyan dide. Di sala 2004'an de li Silêmanî ji bo nivîs û berhemên Kurdî werin berhevkirin û tomarkirin 'Binkeya Jîn' hat avakirin. Weşanxaneyên Spîrêz ve Aras jî ji bo nivîsên Kurdî bi Kurdiya îro bên xwendin dixebitin. Li Îraqê û Herêma Kurdistanê xebatên Tehsîn Doskî ji bo berhevkirina nivîsên Kurdî gelek bi qedr û hêja ne.


**Suriye:**

Hin berhemên di sedsala 19. de bo Almanyayê hatin vegûhastin bi piranî li Şamê hatibûn berhevkirin. Nivîsên Mela Nûriyê Hesarî (1934-2011) ku piştî sala 1950'î nivisîbûn hê jî nehatine weşandin. Heta niha jî li ser nivîsên ku li Suriyeyê ne ti xebat nehatiye kirin.

**Îran:**

Di serî de Pirtûkxaneya Parlementoya Îranê li gelek Pirtûkxaneyên Saziyên Îranê nivîsên bi zaravaya Goranî hene. Di demên nêzîk de bi taybetî jî Mistefa Dehqan gelek nushayên nivîsên nû derxistine holê. Yek ji van berheman jî 'Dîwana Şêx Kurdî' ye. Di Pirtûkxaneya Parlementoya Îranê de bi hejmara 87359 hatiye tomarkirin û 138 rûpel e. Mistefa Dehqan ev berhem gihandiye xwînerên Kurdî.

Hemû gencîneyên Kurdî hê derneketine ser rûyê jiyana nivîskî. Bi hezaran berhemên ku nayên zanîn yên şexsî û yên saziyan ku him di serdema me de û him jî yên serdemên berê ku hê nehatine çapkirin hene.





Her wiha li bajarê Sîne li Zaningeha Kurdistanê di beşa Kurdolojiyê de jî piştî 2013'an gelek xebatên balkêş tên kirin

Selîm Temo, di lêkolînên xwe yên ku li ser Xorasanê kiriye de derdixe holê ku Kurdên Xorasanê ji sedsala 15. ve dest bi nivîsên Kurdî kirine. Selim Temo xwe gihandiye çend nushayan ji van nivîsan.

Perwîz Cîhanî jî mesneviya 'Mem û Zîn' di nav Nivîseke Farisî de ku di salên 1800'î de hatiye nivîsandin dîtiye.

**Ermenistan:**

Karlenê Çaçanî radigêhîne ku; "Li gor zanyarên Rusî nivîsa Kurdî a bi hejmara 7117'an di beşa MESROP MASTOS arşîva Metînêdaran de li Yekîtiya Sovyetê li Komara Ermenistanê, ji sedsalên 10 û 11. maye. Her wiha di heman arşîvê de nivîseke Kurdî bi tîpên Ermenî heye ku 248 rûpel e û di sedsalên 17 û 18. de hatiye nivîsandin. Ev berhem bi hejmara 737'an hatiye tomarkirin. Berhemên ku di arşîvê de bi hejmarên 711, 5060, 10036 hatine tomarkirin jî bi Kurdî ne. Qenatê Kurdo dibêje ku li muzeya etnografya ya Ermenistanê çend nivîsên bi Kirmanckî(Dimilî) hene.

**Îngiltere:**

Li Londrayê di Muzeya British'British Museum' de berhema helbestên Mistefa Bêseranî(1641-1702) hene.

**Fransa:**

Li Enstîtuya Kurdî a Parîsê de ku di sala 1983'an de ji aliyê Kurdan ve hatiye avakirin de berhemên Kurdî hene.

**Avusturya:**

Li Enstîtuya Kurdî a Avusturyayê di Pirtûkxaneya Cesîme Celîl ku ji aliyê Celîlê Celîl ve hatiye avakirin de berhemên ji aliyê wê malbatê ve hatine berhevkirin hene.

**Mısır:**


Li Kahîreya paytexta Misrê di Pirtûkxaneya 'Pirtûkxaneya Netewî A Misirê/The Egyptian National Library de (El-Hizanetu'l-Timuriyye, hejmar: 46) berhemên Ehmedê Xanî, Nûbihara Biçûkan ku di sedsala 18. de hatiye tashîhkirin û Aqîda Îmanê hene.

Her wiha tê zanîn ku li Pirtûkxaneyên Emerîka, Kanada, Îtalya, Danîmarka, Azerbaycan û Erebistana Siûdî jî gelek berhemên Kurdî hene.


*Mehmet Gültekin; 'Zaningeha Petersburgê di derheqê lêkolînên Kurdî, Salaneya Ehmedê Xanî, 2013, r:30-52.*

*Yaşar Kaya; 'Zimanê olî yê Kurdî, Kovara Rewşen, H:1-1992, r:40-41.*

*Zeynalabidin Zinar; "Medreseya Axtepeyê", Nûpelda, H:10/2012, r:23.*







## Tirkiye:

Wezareta Çand û Geştiyarî ya Tirkiyeyê di sala 2012'an de dest bi weşandina nivîsên di pirtûkxaneyan de kir. Heta niha jî (Pirtûkxaneya Zaningeha Erzurumê a Ataturk, Pirtûkxaneya Bajarê Konyayê, Pirtûkxaneya Bajarê Diyarbekir, Pirtûkxaneya Fatîhê a Stenbolê, Pirtûkxaneya Suleymaniye a Stenbolê) nêzîkî 30 pirtûk hatin tespîtkirin.

Li Pirtûkxaneya Zaningeha Artukluyê a Mêrdînê di 'Pirtûkxaneya Kurdolojî' de berhemên ku ji Zaningeha Rusyayê a Saînt Petersburgê anîne hene. Pirtûkxaneya Kurdolojiyê ji bo lêkolîner jê îstîfade bikin tên tomar kirin. Di dawiya 2017'an de dê bê vekirin.

Di derheqê berhemên li Tirkiyeyê ne de xebatên tezên 'Lîsansa Bilind' û 'Doktorayê' tên kirin. Her wiha Weşanxaneya Nûbiharê ji sala 1992'an ve ji bo ku ev berhem bi tîpên latînî bigihêjin xwendekarên Kurdî xebatên balkêş dike. Divê bê destnîşankirin ku heta niha ji aliyê Dewleta Tirkiyeyê ve xebat ji bo Nivîsên Kurdî nehatine kirin.

Di Pirtûkxaneyên taybet yên Abdurrahman Adak, Zahir Ertekin, Ozcan Erboy, Zeynal Abidîn Zinar de jî gelek nivîsên Kurdî yên kevin hene.



## Almanya:

Di sala 1856'an de li zaningeha Berlînê a Almanyayê di destê Prof. Dr. Richard Gosche de 'Nûbihar' hebû. Her wiha gelek berhemên din yên lêkolînerên wek E.Sacheu, Martîn Hartmann, A. Petermann, Le Coq û Oskar Mann li Almanyayê hatin berhevkirin. Di Teza Doktorayê ya bi navê "Kurdische Handschriften/Nivîsên Kurdî" ya Kemal Fûat de ku gelek berhemên wek 'Dîwan'a Ehmedê Cizîrî, 'Şêxê Sena'an'a Feqiyê Teyran, 'Mem û Zîn' û 'Nûbihar'a Ehmedê Xanî li Almanyayê bûne. Gelek agahî di vê mijarê de di teza Kemal Fûat de hene.

Pirtûka li Pirtûkxaneya Zaningeha Tubîngenê 'Arabich-Kurdische Grammatik/ Rêzimana Kurdî-Erebî' di sala 1701'ê de hatiye nivîsandin. Pirtûk 83 rûpel in. Lê nayê zanîn bê ka nivîskarê wê kî ye. Gelo ev pirtûk berhemeke nû ye, 'Tesrîf' a Elî Teramaxî ye? An jî nushayek ji berhema Yûnus Helqetî ku bi navê 'Terkîb' û 'Tesrîfa Kurmancî' ye?

Îro li Almanyayê 130 pirtûkên Kurdî hene. Lê mixabin xebatên di derheqê van pirtûkan de pir kêm in.

---



FIRAT CEWERÎ

## Nivîskarî û Desthilatdarî

Gava ez kitêbên bîranînan dixwînim, ew fîktîf bin jî, heke ew rastiyê berovajî bikin û hisa bêbaweriyê li ba min peyda bikin, ez tavilê li xwendina wan sar dibim û dikim nakim nema careke din lê germ dibim. Bi taybetî jî ew nivîskarên edebiyata bedew ên ku di prosesa avakirina berhemên xwe de ji tirsa civatê, dîn, an jî siyasetê xwe dispêrin xwesansurkirinê. An jî nivîskarên ku ji bo xwe têxin çavên desthilatdariyê, di berhemên xwe de dest bi şelafiyê dikin, rastiyê berovajî dikin û êrîşî vî alî û wî aliyî dikin.

Hingî ew berhemên edebî nabin berhemên ku ji mêjiyê nivîskaran ên azad danisilîne, lê ew li gora exlaqê kategoriyên ku min li jor hejmartin, bi otosansurê, an jî bi alîgiriyeke beloq hatine pê. Berhemên welê temenkurt in, ew nagihîjin nivşên li dû xwe, heta bi têra nivşê xwe jî nakin. Berhema ku bi temamî ji dil û aqilê nivîskar hatiye pê, ew berhem di dema xwe de bibe armanca rexne û êrîşan jî, ew berhemeke pêşerojê ye. Heke ew ji destên nivîskarekî hoste derketibe, ew ê ji nivşan bigihîje nivşan û têkeve nav refên kitêbên nemir. Ew berhemên nemir ên ku ji dema şerên sar û germ xwe gihandine dema me, berhemên welê ne. Yek ji berhema ku wek kitêba kitêban, an jî wek romana romanan tê naskirin û nîşana romana modern e, Ulyssesa James Joyce e. Joyce ji welatê xwe xeyidîbû, berê xwe dabû sirgûnê û nema li welatê xwe vegeriya. Wî berhema xwe bi mesafeyeke ji welêt dûr, li sirgûnê nivîsand. Ev kitêba mezin ku behsa Dublinê dike, di rojekê de dibuhure. Nivîskarê romanê ê bixwebawer, dibêje, heke rojekê ji rojan bajarê Dublinê ji ber bobelatekê ji navê rabe û nemîne jî, Dublineke nû dikare ji ber romana wî were avakirin.

Lê ev romana ku gelek stîlên edebiyatê tê de hatine ceribandin, bêyî otosansurê hatiye hûnandin. Loma, ew di dema xwe de bûye hedefa sansur û heqaretan û nivîskar ji bo weşandina wê zehmetiyên mezin kişandine.

Ez nabêjim bila her kes wek James Joyce bin, lê divê her kesên ku bi edebiyatê re mijûl in, edebiyata xwe nekin qurbana siyaseta rojane û fikrên xwe ên îdeolojîk. Ji ber ku insan benderuhekî guherbar e; kengî be, ew dikare xwe ji aliyê siyasî, ji aliyê celebê jiyanê, an jî ji aliyê xwarin û lixwekirinê ve biguhere. Lê her cara ku ew xwe biguhere jî, divê berhema wî/wê xwe biparêze. Bi gotineke din, divê ew berhema ku hatiye weşandin, di her xweguhertinan de jî bi zewqeke edebî were xwendin.

Ji bo nivîsandina berhemên weha dûrbînî û cesareteke xurt lazim e. Ev cesaret ji bo nivîskarên civatên pêşketî, yanî ji bo nivîskarên civatên endustriyel zêde pêwîst nake, lê ji bo civatên ku xwe ji kontrola eşîrî, civatî, dînî û siyasî rizgar nekiribin, pir zehmettir e. Nivîskarên ku didin dû dil û aqilên xwe û qeyd û merbendan dişikînin, ew serî jî hildidin. Ew nadin dû sîstem û civatên heyî, lê bi helwesta xwe ya serîhildêr dixwazin civatê li dû xwe rakişînin. Ew dixwazin bi riya lehengên xwe rengekî nû bidin cîhana heyî. Loma, ew xwe di hilbijartina karakterên xwe de azad dibînin. Ew carina jinekê, carina mêrekî, carina evîna jin û mêrekî, carina çikûsekî, carina qehbikekê, carina parsekekî hildibijêrin. Lê carina jî ji ber ku ew qehremanekî, an jî ji tirsonekekî qehremanekî neafirînin, dikarin ji ber wê helwesta xwe tûşî rexneyan bibin. An jî gava ew qehremanekî ne bi çavên desthilatdariyê, lê bi çavên xwe dibînin, dihûnin, vedibêjin û ew ne wek desthilatdariyê, lê wek xwe dibêjin, hingî dikare serên wan têkevin belayên mezin. Ew dikarin bên girtin, derbeder bibin; an jî bi zixtên desthilatdariyê ji aliyê civatê ve werin destheramokirin û kes silavê nedin wan.

Rast e, nivîskar dikarin biêşin, ji xwe nivîskarî êş e. Lê dermanê êşa nivîskar dîsa berhema wî/wê ye…

Sefernameyek-II

# Baholeke Winda li Hong Kongê







Dema hat anonskirin ku balafira me datê balafirxaneya Hong Kongê, li derve berêvarî bû. Neh saetên rast li gor pêşbîniyan em li esmanan berevajiyê gera rojê çûbûn û ji şeva Stenbolê vêga diketim nav êvara Hong Kongê.



CIWANMERD KULEK

**DEMA** hat anonskirin ku balafira me datê balafirxaneya Hong Kongê, li derve berêvarî bû. Neh saetên rast li gor pêşbîniyan em li esmanan berevajiyê gera rojê çûbûn û ji şeva Stenbolê vêga diketim nav êvara Hong Kongê. Tekerên balafirê bi erdê bûn pê ve, şîrqeşîrqa qayîşên ewlehiyê ên ku bi bêtebatî zûka ji hev vedibûn, vekirina cîhazên elektronîk û hêwirzeya mirovên ku vê gavê ji ciyên xwe rabûn, baholên xwe ji kabînên ser seran wergirtin û li bende vekirina deriyan man... anî bîra min ku hin tevger û îşaret li ti derên cîhanê naguherin.Piştî ku ez ji balafirê derketim, rêk û pêpelûkên ku min da dû wan ez anîm ber stesyoneke piçûk a trênê di hundirê balafirxaneyê de. Yekem car min di balafirxaneyekê de xeta trênê didît ku di nav termînalên balafirxaneyê de mirov dibirin û dianîn. Li ser pirsa min a bi ecêbmayîn, xortikekî ji Asyaya Dûr ez serwext kirim ku diviya li wê trênê siwar bibim û li rawestgeha dawî peya bibim da ku bigihêjim Termînala yekê û ji wir li ferîbotên Macauyê siwar bibim. Çi tiştekî xweş, min di dilê xwe de got. Bendergeha keştiyan jî di balafirxaneyê de bû. Li rawestgeha dawî peya bûm, di pêpelûkên otomatîk re derketim hola Termînala 1ê; dîtina ku min dît, du jinikên hûrik ên bi şal, şepqe û montên unîform, devê wan bi paçikekê girtî, cîhazek di destê wan de, li jora pêpelûkan li pêrgîya rêwîyan sekinandî ne. Hînê min fahm nekir çi ne, ji çi re ne, min dît yekê ji wan xwe gal kir û aleta di destê xwe de bilind kir û zoq rakir nav çavê wî xortikê li kêleka min ê ku rê ji min re tarîf kiribû.

Carina derdek, belayek yan jî nexweşiyek tê serê mirov, ku mirov dibêje heta wê gavê nehatiye serê kesekî. Lê dema mirov behsa wê ji hinan re dike mirov dibîne ku her kesî bi awayekî pêzanînek, serhatiyek yan jî bîranînekî wî ê li ser meseleyeke wiha heye û mirov hem şaş dimîne ku mirov çawa heta niha hay ji wî tiştî nebûye û ji aliyekî de jî kêfxweş dibe ku ne bi tena xwe ye di wê derd û meseleyê de.Piştî ku ji bo festîvaleke edebî, The Script Road Festival – Rota das Letras, ez hatim vexwendin bo Macauyê, di her tiştê ku derdiket hemberî min de min êdî şopa vî navî digerand. Û min ferq kir ku têra xwe hebû û ez şaş mam ku heta wê gavê min çawa hay jê nedibû.Gava min di weşaneke navnetewî de nûçeya kuştina birayê ne heq ê serokê Koreya Bakur xwend li vî navî rast hatim. Rojnameya ku îşaret bi iddîayên kuştina vî zilamî ji alî serokê paranoyak ê Koreya Bakur dikir, li ser kuştina wî hin agahiyên balkêş didan. Birayê saxik bi madeyeke CX a siniran, ango madeyeke kimyewî, hatibû kuştin. Kamerayan û guwahên li wê derê du jinik dîtibûn ku ew made avêtibûn ser çavê wî û dû re wî tiştê şil ji ser rûyê wî maliştibûn û ji wir reviyabûn. Di vê hewalê de peyva kilîl a ku ez lê digeriyam di vê derê serhatiyê de bû: Evî birayê ne heq li balafirgeha Malezyayê dema ku dê li balafirgeha Macauyê siwar bibûya hatibû kuştin. Nûçeya ne xweş a derbarê guzargeha min de tenê ne ev bû. Di weşaneke dî de jî min xwendibû ku yek ji mirovên herî zengîn ê Çînê li Hong Kongê hatibû revandin û di vê meseleyê de jî guman diçûn ser polîsên Çînê û dewleta Çînê dihat tohmetbarkirin.

Dengûbehsên dek û dolabên hêzên tarî ên ku min di rojnameyan de xwendibûn ji serî de pêjna metirsiyê li dor navê van welatên dûr afirandibû, lewma  gava li serê pêpelûkan min wê tevgera du jinikên sosret a li hember xortê li kêleka xwe dît, kêliyekê qilqilîm. Lê lawik li hemberî aleta ku rast hat nava çavê wî ne deng ji xwe anî û ne dest bir xwe. Ez hêdîka ji wan bihurîm. Jinika dî a ku vala mabû jî xwe li ber rêwîyekî dî rep kir. Wê hingê min dezgehekî piçûk li hember xwe dît. Li ser vî dezgehê ku du mêrên bi heman cilûbergan li berê rûniştî bûn, wiha dinivîsî: Temperature Check. Nizanim çawa fahm dikirin û hildibijartin, lê van karmendên devgirtî, bi unîforme û aleteke destan, carê di nav mirovên ku dihatin de yek dineqandin û bi wan aletan germahiya wî dipîvan. Digel ku di ti gotar yan weşanekê de hînê ji bo min nebûye peyva kilîl a ku şopa wê bigerînim jî, vîrusên Zika, Ebola, şewba berazan, HIVê, ji çek û endamên terorî, mafyayî û sîxurî bêtir û hêsantir li cîhanê digerin û canan distînin. Gelo tişta ku diviya herî pirr jê bitirsiyama û min jê fikar bikiraya evan gef û xeterên nedîtbar bûn? Ger her gerr û rêwîtiyek bagajek bû, nexwe di vê bagajê de ciyê jîndarên piçûçik ên nedîtbar û mirindar jî hebû?

Bilêta keştiyê berevajiyê gumanên min ne bi 254 dolarên Hong Kongê, lê bi 285 dolaran bû. Dema çarneçar min xwest bi kerta krediyê heqê wê bidim, xortê wê derê şûneke First Class pêşniyazî min kir bi 295 dolaran, bi buhayekî taybet ji bo kerta min. Ez heta hingê her tim li keştiyên Stenbolê ên bê class siwar bûbûm, li vî perrê dinyayê di navbera Hong kong û Macauyê de, rêwîtiyeke First Class a bi keştiyê fikreke xweş bû û min dicî de qebûl kir. Jê bi şûnde barê min sivik bûbû. Saet hînê pênc bû û keştî dê du saetên dî ji wir rabûya. Bahola min jî, şirketa guzariyê dê ji balafirê veguhezta keştiyê. Li nava termînala ku bi ronahiyeke zer hatibû ronîkirin, aramiyeke heçku diket nav destan hebû. Xwedêkirî ez hatibûm, min got di dilê xwe de. Li xwaringehekê self-service min teyfikek noodleên biraştî û çayeke bi lîmon û qeşa xwest.Min li maseyeke ku zilamekî şîva xwe dixwar ciyek ji xwe re peyda kir û bi darikên xwarinê ên di nav tiliyên min de bi şeloşehtî diliviyan ketim ser xwarinê. Bêhnê carekê jî min di bin çavan re li mêrikê hember xwe dineri, ê ku bi hostahî darikên xwe di nav tasa xwarineke wek şorbeyê dadikir. Camêr piştî ku xureka nav tasê qedand, rahişt kefçî û ava şorbê bi şerpeşerpeke werrê bi ser dilê xwe dakir ku nayê gotinê. Vî dengê ku min di serî de got qey tenê ew camêr derdixe, dû re min li çend xwaringehên Macauyê jî bihîst û têgihiştim ku ew jî şêwaza Rojhilata Dûr a xwarina tiştên avî ên wek şorbe û tirşikê ye.

Piştî xwarinê ez li hola termînalê li ser kursiyekê rûniştim û min pal veda. Min çavek li înternetê û e-mailên xwe gerand, û dû re deftera xwe vekir, çend têbînî nivîsîn. Hînê werrê qelem di destê min de, serê min bi ser defteramin de xwar, min dît yek li ser serê min sekinî ye, deng li min dike. Min serê xwe rakir. Xortekî jar, dirêj û bi berçavk bû.Di nav qatê cilan ê gewr û ûtîkirî de wek barek hestî bû. Porra wî ya reş û hilûs, çavên wî yên hûrik, mîna karîkatureke Asyayiyên Dûr bû.Pirsî ku ez bûm ewî rêwiyê ku ji Stenbolê dihat û diçû Macauyê.Piştî ku min ew erê kir, gote min ku bagaja min winda bûye û pirsa şiklê barê min ji min kir. Valîz nexuya bû û bi karmendên fîrmaya hatûçûyê re ketibûn têkiliyê, ew ê niha karmendek bihataya, lewma ji min xwest ku bidim pey wî. Ez lidû wî çûm ciyê siwarbûna keştiyê û li benda karmend mam. Berî wextê siwarbûna ferîbotê bi pênc deqeyan xortekî kutikî, gomlekekî spî ê berstûka wî vekirî lê, hat û ewreqek bi min da îmzekirin. Bahola min li Stenbolê mabû û wan herî nêzîk roja dîtir bi şev dikaribû wê bigihînin hotêla ku ez ê lê bimama. Bi vî rengî, bêyî ku firçeyeke diranan jî digel min hebe, li First Classa xwe siwar bûm û di tariya şevê de ji bendergeha Hong Kongê berev Macauyê bi rê ketim.

## Dengûbehsên biçûk ên cîhana mezinên hepsê

Carina tiştên nayin aqlê mirov jî li balafirxaneyên cuda ên cîhanê dertên pêşiya mirov û mirov her tim ji wan re ne amade ye çunkî tiştên wiha di aqlê mirov re derbas nabin. Bo nimûnê, tê aqlê kê ku li balafirxaneyên Ruandayê mirovan didin sekinandin û çente û baholên wan didin vekirin eger tiştekî plastîk tê de hebe. Ji ber ku li Ruandayê plastîk hatiye qedexekirin, weke çekeke mirindar be, alavên plastîk ji mirovan tên standin û tên tinekirin. Vêca ez li bende bûm ku li Hong Konga ku navê wê tenê ji filîmên aksiyonê di bîra min de mabû gosirmetek derê pêşiya min, lê min nizanibû ew tişt çi ye. Xwezî ez di wî temenî de bûma ku min hêviya dîtina ejdehayekî agir ji devan dertê bikira. Lê êdî min temenê hin xeyalan derbas kiribû û xem û xeyala min li ser tiştekî dî bû: Min hînê jî bawer nedikir ku bê vîze dihatim Hong Kongê; vî welatekî piçûk, xurt û seyr, yek ji lîmanên herî girîng ên bazirganiya cîhanê,ku di nava du împeratoriyên mezin (Çîn û Brîtanya) de esirîbû û berev asîmanan bilind bûbû.



## Li rûyê zimanê xerîbiyê



Gava balafir di ser deryayê re daket balafirxaneya Hong Kongê tiştê ku min di paceyê re dît tenê hin greyder, kemçe û vînc bûn ku li dora pîstê kom bûbûn. Ji zeviya rût a ku van makîneyên kar li ser bûn bi wir de, hin çiyayan li kêleka hev reş dikir. Min di beşê yekem de gotibû ku balafirxane têra xwe serkeftî bûn di afirandina zimanekî hevpar ê îşaretan de ji bo mirovên xwedî ziman û çandên têvel û ji deverên cuda ên cîhanê. Lê dîsa jî li her cîyê ku mirov diçiyê ne mumkin e ku mirov tiştekî ku li ciyekî dî nedîtiye nebîne û cardî têkeve keftûleftê li hember xerîbiya di vî zimanî, ango di wê pergalê de. Ji xwe re tenê adet û îşaretên ser avê (daşirê) melheze bikin, hûn ê mebesta min fahm bikin. Gelo çend îşaretên cuda hene li cîhanê ji bo destnîşankirina daşirên jin û mêran li ser deriyan? Sîstema kaxezan, avê, sabûnê, ziwakirinê, gilêşê, teşeyê deriyan, destavên ser piyan, awayên bikaranîna evana û texlîdên dorûberên wan hemû li her cîyekî bi nuanseke dî derdikevin pêşiya mirov. Kengî mirov ji zimanê van îşaretên li cî û şûngehên cuda ên cîhanê serwext dibe, mirov hêdî hêdî taya xerîbiyê ji ser xwe davêje û hinekî hogirî wir dibe. Heye ku guhertina van adetên piçûk ên jiyana rojane ji guhertina fikr û regezan zehmettir be. Em bêhnikekê bifkirin ku li Îngiltereyê muslixa (kaniya) teharetê li klozetên avrêjê hat zêdekirin? Gelo dê qiyameteke ji Brexitê mezintir nebe? Yan jî ew kanî ji daşirên alafranka ên Tirkiyê hat birrîn? Digel ewqas pêşketin, geştiyarî, peywendî û hevnasîn, di her gera xwe de mirov his dike ku mirovatî hîn di wî çaxê xwe yê zarotiyê ê dema fêrbûna tevgera ser avê de ye.



## Xeyalek Asîmanî:

# Kî dibêje Dêrikî nikarin bifirin?



NÛJÎN ONEN

HIN mirov bi stranê, hin bi dansê hin jî dema difirin xwe azad his dikin. Ezê ji we re çîroka yekî Dêrikî ku gava difire xwe azad his dike bibêjim. Tarık Ayebe berî 16 salan dema ji bo betlaneyê diçe navçeya Muğlaya Fethiye li wir xwe ji berwarên bilind bi paraşûtê berra jêr dide ji wê rojê û şûn de Ayebe dibêje ez bûme dildarê firînê û paraşûtvaniya berwariyê di jiyana min de di asteke bilind de ye. Tarık Ayebe dibêje min perwerdeya vê sporê dîtiye û li çar aliyê çiyayê Dêrikê em dikarin bi paraşûta berwariyê bifirin.

Ev spor li gelek bajarên Tirkiyeyê pêk tê, Ayebe yek ji wan kesan e ku ev spor aniye û li Dêrikê jî pêktîne. Firokevanê paraşûta berwariyê Tarık Ayebe ji Heftenameya Basê re behsa vê sporê û hurguliyên wê kir.

**''Min cara yekem azadî bi vê sporê his kir''**

Tarık Ayebe diyar dike dê di demek nêz de komeleyekê damezirînin û firînên xwe di bin navê vê komeleyê de pêk bînin. Di heman demê de li bajarên der dora Dêrikê kesên ji spora paraşûtvaniya berwariyê hezdikin tên li vir difirin. Ayebe dibêje cara yekem min azadî bi vê sporê, bi firînê hîs kiriye.

Tarık Ayebe çawa ev spor nas kiriye ji me re wiha vedibêje ''Nêzî 15-16 sal berê dema ji bo betlaneyê ez çûm Fethiye-Ölüdeniz'ê cara yekem min ev spor li wir dît. Piştî ez bi paraşûtê ji ser çiyayên wir firiyam, di hest û fikrên min de hin guherîn çêbûn. Beriya hertiştî min azadî cara yekem bi paraşûtvaniya berwariyê hîs kir. Piştî vê, min biryar da, ez ê li cîhê ku lê mezin bûme jî vê sporê pêk bînim. Min perwerdehiya vê sporê li Erzîncanê li Saziya Firokevaniya Tirkan stend. 25 rojan min li wir perwerdehî dît. Cara yekem ji girên 50-60 metreyî me xwe berra jêr dida piştre yê 160-170 metreyî. Bi vî awayî min tecrûbeyeke baş girt. Piştî ku min perwerdehî stand, ez hatim Dêrikê û li vir min dest bi vê sporê kir.''



**"Ji min re digotin ''Ma tu dîn bûyî?"**

Ayebe dibêje dema 15-16 sal berê min ji xelkê digot ezê li Dêrikê bi paraşûta berwariyê bifirim ji min re digotin ''Ma tu dîn bûyî?'' Lê niha gelek ciwan hezkirina wan li hember paraşûtê çêbûye, zarok extiyar bi meraq temaşe dikin. Gelek kes dixwazin ku perwerdeya vê sporê bistînin. Niha derfet û belgeyên min yê dayîna perwerdehiyê tune, tenê ez dihêlim bên temaşe bikin, di demên pêş de ez belgeyên xwe bistînim ezê perwerdehiyê jî bidim."

**"Dêrik dikare bibe yek ji cîhê paraşûtvaniya berwariyê"**

Ayebe diyar dike ''Çiyayên Dêrikê ji bo vê sporê gelekî guncaw in" û dibêje Girekî Êrge Baba heye ku ji çar aliyan jî mirov dikare bi paraşûtê ji wir bifire, ba ji başûr, bakûr, rojava, rojhilat bê ferq nake dîsa jî mirov dikare bifire ev avantaja me heye. Ji bajarê din hevalên min bo bi paraşûtê bifirin tên Dêrikê. Gelek hevalê min dibêjin Dêrik dikare bibe yek ji cîhên paraşûtvaniya berwariyê."

Ayebe; Li Tirkiyeyê rekora bi paraşûta berwariyê hatiye kirin 352 km ye. Ev rekor li Dinyê 650 km ye. Ayebe wiha behsa firînê Dêrikê dike; "Mesela baskên paraşûta me di hundir seatekê de di navbera 30 km û 48 km yan difire. Baskekî di hundir seatekê de 35 km difire dema ba bide paş xwe di hundir seatekê de 55 km dikare bifire. Hevalekî me ji Dêrikê bi paraşûta berwariyê firiya li Kiziltepe di hundir seatekê de bi lezbûna 32 km, lezbûna wî ya navîn 61 km daket Kiziltepeyê."

**"Em dixwazin ev xwezaya bêhempa bidin naskirin"**

Ayebe wiha behsa projeyên xwe dike: "Xeyala min ya yekem ev bû ku li asîmanê Dêrikê bifirim. Ya dûyem, Saziya Sportîf a Bakûrê Dêrikê bi navê komeleyekê damezirînim û di bin navê komeleyê perwerdehiya vê sporê bidim ciwanên Dêrikê û di qada navnetewî de ji bo beşdarî pêşbirkên paraşûtvaniya berwariyê bibin wan perwerde bikim. Ji xeynî paraşûtvaniyê dema komele ava bibe meşa xwezayê, futbol, basketbol, festivalan jî emê pêkbînin. Xwezaya Dêrikê ji bo van sporan gelekî guncaw e. Di heman demê de em dixwazin xweza û navçeya xwe bidin nas kirin.

**"Li navçeyeke weke Dêrikê çawa paraşûtvaniya berwarî dibe?"**

Ayebe li ser pêşdaraziya mirovan ya li hember herêmê jî wiha diaxive: "Mamosteyên ji Enqere, Denizli, Hatayê lê yê ku li Mêrdîn an bajarê din mamostetiyê dikin tên li Dêrikê vê sporê dikin. Ez dixwazim mînakeke wiha bidim; Du peristarê ji bajarên Tirkiye hatibûn Dêrikê dema bihîstin ku li vir sporeke wiha pêk tê ecêbmayî mabûn û digotin li Dêrikê çawa vê sporê dikin? Dema 16 sal berê li Ölüdenizê bi paraşûtê ez firiyam û kesên derdora min bihîstibûn ez Mêrdînî me, li cem wan ev tiştekî ecêb bû. Çima tiştekî wiha nebe? Ma tenê kesên ji Muğla an Ölüdenizê dikare bifire? Çime kesekî Dêrikî nikare bifire? Pêkhatina vê sporê pêşdarazên xelkê jî gav bi gav dişikîne."

**"Mirov dibe dildarê vê sporê"**

Ayebe bi saya rojnameya me bangî ciwanên Dêrikê dike û dibêje bila vê sporê ji nêz ve nas bikin û wiha berdewam dike: ''Bila werin perwerdehiya vê sporê bistînin, ev spor nû pêş dikeve, ji bo ruh û laşê mirovan jî ev spor gelekî baş e. Beriya her tiştî tu azadiyê heta serê tiliyê xwe his dikî dema difirî. Ji ber vê yekê dema kesek carekê bi paraşûtê difire dibin dildarê wê.

> ''Yekem xeyala min ev bû ku min dixwest li asîmanê Dêrikê bifirim ya duyem, Dezgeha Hewayî ya Sportîf a Bakurê Dêrikê bikim komele û di bin navê komeleyê de ciwanên Dêrikî di warê paraşûtvaniya berwarî de perwerde bikim.''

## Pêvajoya perwerdehiya vê sporê çawa ye?

Li gor Tarık Ayebe di çar rojên ewil de dersê teorîk didin xwendevanan. Piştî vê, xwendevan di azmûnekê de derbas dibin. Heger ku di vê azmûnê de ser bikevin, Alavên vê sporê didin nasîn. Pişt re bi mamosteyên vê sporê re dest bi dersên pratîkê dikin. Di destpêkê de ji ser girên 50-60 metreyî bi paraşûtan em difirin, Di vê merheleyê de mamoste her tim bi me re ne. Yek li ser gir disekine yek jî li jêr disekine bi piştgiriya wan em firînên xwe pêk tînin.





## Beriya firînê amadekariyên çawa tên kirin?

Firîna bi paraşûtê ne tiştekî hêsan e. Ji bo wê divê meriv derbarê ba û hewayê xwedî zanyarî be û her tim di şopandina vê yekê de be. Ayebe wiha behsa amadekariyên beriya firînê dike: ''Di serî de em rewşa hewayê kontrol dikin. Berê ba, lezbûna ba û darbeyên ba beriya 2-3 rojan em şopa wan dikin. Pişt re em di malperên înternetê de raporên ba jî kontrol dikin û em derdikevin ser gir. Ji bo firînek baş divê lezbûna ba 5-20 km be. Lezbûna 0 km jî û di 25 jî be ji bo firînê hejmarên xeter e. Ji bo firînê rêbaza herî rast ev e divê him bayê li ser gir û him jî yê li jêr bê pîvan. Ji bo vê aletên me hene. Bi vî awayî em biryara firînê didin. Heger ne li gor pîvanan be em bi paraşûtê nafirin.

